

Hevkariya stratejîk a Kurdan û Amerîkayê xurttir dibe

Rûpel 4

peyama *Kurd*

Rojnameya Giştî ya Hefteyî

Kurdish weekly newspaper

Hejmar 37 / Sal 1

20.05.2005

Kurdische Wochenzeitung



Gelo hûn dixwazin
bextewar bin?
Fermo ji we re deh
prensîbên bextewariyê

Rûpel 2

Ewrûpa
pistgiriya Evdila
Öcalan dike

Rûpel 6

Nê tenê li Tirkîyê,
li Hollandayê jî
axaftina bi zimanê
Kurdî qedexeye

Rûpel 8

Taybetî û pêwistiyê
pêvajoya avadariya
Kurdistana Başûr

Rûpel 9



Mihrîcana Cannesê bû şowa Kurdan

Wezîrê Çandî yê Fransayê Renaud Donnedieu di axaftina xwe de got; "Kurdistan bi Peymana Lozanê hatiye perçê kirin."

Rûpel 3

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, \$ 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



4 196577 401503

37

Gelo hûn dixwazin bextewar bin?

Fermo ji we re deh prensibên bextewariyê

Ger hûn ji stresê û ji hengame û tevliheviya jiyana rojane wesiyanbin, qet ne zor e ku hûn xwe çêtir his bikin. Esta deh prensibên bextewariyê. Pevçûnên li malê, problemen zarokan, nexweşiyên li kar, astengiyên aborî û serêşiyên siyasi.

Belki evîna we ya bêbersiv psikolojiya we xira kir; hûn gêj û teyş bûn. Heta bi we re şopên depresyonê peyda bûn. Hûn dixwazin biçekî ji derdora xwe bidürkevin; lê ne pere ne ji wexta we heye. Ji xwe re nekin derd, ji ber ku derdê bêderman tûne ye. Ji bo ku hûn xwe baş his bikin, fermo ji we re deh prensibên bextewariyê.

Rast nefesê bistînin

Em cîgera xwe bi % 20 kapasitê bi kartinin. Wexta em di nav stresê de bin nefes stendina me dijwartir dibe. Diyafram (betana zik) tê guvaştin û di hucreyan de oksijen kêm dibe. Ji bo rast stendina nefesê çavên xwe bigirin, zikê xwe binepixînin û bi pozê xwe nefesê

bistînin. Heta deha bijmîrin û bi devê xwe nefesê bidin. Eynî karî liser hev pênc caran dubare bikin.

Masaj bikin

Yek ji riyên rehetkirinê masaja lin-gan e. Li erdê rûnin, paniya xwe bi herdu tiliyên xwe yên beranek-mezin daîreyan çêkin û masaj bikin (bifirkînin). Piştre bi hotikan (kulm) hêdi-hêdi li ser û bin lingên xwe bidin. Piştre herdu tiliyên mezin yên lingên xwe baş bikşînin. Wê masajê li temamiya lingên xwe bikin.

Xwe li himber stresê bermedin

Wexta mirov bi stres be serê wî, wê diêşe û milên wî/ê xûz dibe. Çareseri geleki hêsan e. Bi destê xwe yê rastê li ser hestiyê bêrokê yê aliye cepê û her weha bi destê xwe yê cepê li ser hestiyê bêrokê yê rastê daîreyan çêkin û masaj bikin. Hûn vê masajê li her derê, şîpya yan rûniştî dikarin bikin.

Gewriya xwe rehet bikin

Gava mirov hêrs dibe di gewriyê de girêk çêdibin. Xilasbûna ji girêkan ji ne zor e. Pozê xwe piçekî bisidînin û hêdika nefes bistînin.

Çikolata bixwin

Cikolata ku tiji magneyûm e, moralê bilind dike û li himber stresê rehetiyê dide mirov. Fêkiyên hişk ji stresê kêm dikan.

Destê xwe hereket bikin

Destê xwe yê rastê deymin ser singa xwe ya cepê û berjêr û berjor bînin û bibin Eynî karî bi destê xwe yê cepê û li ser singa rastê dubare bikin. Ev masaj ji wê rehetiyekê bide we.

Sinirên xwe sist bikin

Eger sinirên we vezelandî be, destê xwe deymin nîvê herdu memikên

xwe û ber bi aliye rast û cepê ve bilivînin û masaj bikin.

Çavên xwe rehet bikin

Wexta we nerehetiyek an westan-dinek di çavên xwe de his kir, bi kefa destê xwe çavên xwe bigirin. Ev germî û tarî wê alikariya we bike.

Pozitîf bifikirin

Li ser pîrsîrîkênen rojane zêde ranewestin û serê xwe neêşîn. Xwe ikna bikin ku ev di jiyana we de pir ne girîngin û her berdewam dikan. Pîrsîn bîcûk zû jîbir bikin..

Rehet bikin

Xwe li erdê dirêj bikin û rehet berdin. Di navbera çend deqiqeyan de hûnê xwe giran his bikin. Dengê stendin, û berdانا nefesa xwe guhdar bikin. Berî ku ji erdê rabin temamiya bedena xwe vezelînin.

Birêzan,

Wek hûn ji dizanin, me di meha Îlona sala derbasbûyi de dest bi weşana rojnameya hefteyî Peyama Kurd kir.

Bi vê xebata hanê, me hewl da ku em ji bo dagirtina valahiya di rojnamevaniya Kurdi de, ji ziman û çanda Kurdi re xizmetê bikin. Em bawerin ev ji bo çapemeniya Kurdi xizmetek e. Bêguman hê gelek kêmasyîn me hene. Ev rastiya hanê bala we xwendevanan ji kişandiye.

Lê jibona ku em bikaribin di karê xwe de berdewam bin û kalîteya rojnameya we bilind bikin, divê di warê imkanên malî-diravî de astengiyên me nemînin. Em ji aliye xwe ve hewl didin ku rojnameya we Peyama Kurd di her warî de dewlemendîr bikin.

Lê em hêvidarin ku xwendevanen me ji hinek alikariya me bikin. Bi vê minasebetê em tînin bîra xwendevanen xwe yên hêja, ku bê kêmahî abonementiya xwe birêbikin. Di nav xêr û xweşiyê de bimînin.

Peyama Kurd

DESKRİPŞON

KURDISH BOOKS
PEYAMA KURD VERLAG
DÖVRE KURD

THOMAS-MANN-STR. 24, 53111 BONN / GERMANY
Fax: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Tele: +49 (0228) 18 00 656
WWW.PEYAMA-KURD.COM
INFO@PEYAMA-KURD.COM

REDAKSIYON

KURMANCEVÎ JİYAH
Fâtî, ÖZELİK (Editor: Bâzî)
ŞİMAW HÜSEİN BEKIR (DRAKOR)
PAHMAV (BİSTİYANNA-HAGAZIN)
KURDI (ZÂRANI)
SEYDÎSAN KÜLTÜ (Editor)

KURMANCEVÎ JİYAH
DANA ALI, VENUS FAU, NIZAR ÇAL, CİTYAH DANIHOV,
MANGUR SIDDI, MUSTAFA CHIKAYAT

PEYAMA KURD İMARET MEYDANI, KÜNYE: KÜRT MİLLİ MÜSTAKİBİYETİ
EN İLK İZMİR İL MASTİYEVİYE VE DI STRASBURG'DA İHRAM DE AZAD
L. PEYAMA KURD BİRİMİ, KÜNYE: KÜRT MİLLİ MÜSTAKİBİYETİ
BELAVKİLEN, NAMEŞİNE

Di 58. Mihrîcana Cannesê ya Navnetewî de şova Kurdan

Hêvîdar Zana

Roja 11ê Gulana 2005an, Mihrîcana Cannes ya Navnetewî li Başûrê Fransa li bajarê Cannesê destpêkir. Axaftina vekirina Mihrîcana Filman ya Cannesê ji aliye derhênerê Amerikî Alexander Payne ve hat kirin. Di mihrîcanê de, bi dehan stêrkên sinemayê yên bi nav û deng û bi sedan derhêner besdar bûne. Di merasima vekirinê de derhênerê Yugoslav yê navdar Emir Kusturica, aktrisên Fransî yên weke Catherine Deneuve, Charlotte Gainsbourg û Charlotte Rampling û Wezîrê Çandî yê Frensa Renaud Donnedieu amade bûn. Juriya mihrîcana îsal ji aliye derhêner Emir Kusturica ve tê birêve birin. Di nava endamên juriyê de navê weke Selma Hayek, listikvanê Spanî Javier Bardem, xwediyê xelata Nobelê Toni Morrison, derhênerê Hong Kongî John Woo, listikvana Hindî Nandita Das û derhêneren Fransî Agnes Varda û Benoit Jacquot cî digrin.

Di Mihrîcana Cannes ya Navnetewî de wê îsal 20 filmên ji welat û çandên cuda liser wergirtina xelata Palmya Zérin bi hevre têkevin pêşbirkê. Yek ji 20 filmên ku besdari mihrîcanê bûne, filmê derhênerê Kurd Hiner Saleem yê bi navê "Kilometer Zero" ye. Film ji aliye Hikûmeta Kurdistanê ve hatiye piştgirikirin û ew ji xeyni du-sê sehneyan bi temamî li Kurdistanê hatiye kişandin. Roja diwemîn a mihrîcanê, seet 10.000e êvarê galaya filmê Hiner Saleem bû. Di wê rojê de listikvanen sereke yên film Belgîm Bilgin û Nazmî Kirik ligel derhêner Hiner Saleem beri galayê derketin pêşberî wênekêşan û piştre ji wan li salonek taybetî, ligel Wezîrê Rewşenbirî yê Hikûmeta Kurdistanê Samî Şoreş û serokê Enstituya Kurdi ya Parîsê Kendal Nezan bersîva pirsên rojnamegeran dan. Di van her du çalakiyan de ji bala wênekêş û kameramanen televizyonan li ser bedewiya aktrisa film Belgîm Bilgin bû. Bi dehan televizyon û rojnameyê cihanî ligel listikvan û derhênerê Kurd hevpeyîn çekirin û wêneyê wan yên taybetî kişandin.

Filmê "Kilometer Zero" li ser rewşa Kurdan a di pêva-

joya dema şerê Iraq û Iranê de ye. Ew dixwaze drama Kurdan di kesayeta malbatek ciwan de bide nîşandan. Ako (Nazmi Kirik) zewicî ye û bavê zarakêkî ye. Ew di wê dema nexweş de mecbûr dimîne ku biçe leşkeriyê. Di dema leşkeriyê de dibe şahidê zexta ku li Kurdan dibe. Dijwariya şer, kuştin, xwin û neçarî, dihêlin ku ew ji rejîma diktatoriye nefretê bike. Ew ligel şiferekî Ereb, cenazeyê leşkeran li ser

malbatê wan digerine. Li aliyeke cenaze diçin û li aliyeke ji peykerên Seddam. Ev sehne heta dawiya film ji dirêj dibe. Dema ku cenazeyê hevalekî Ako ji şer tê û ew mecbûr dimîne ku cenaze bibe teslimî malbata wî bike, êdî hêrsa wî diteqe. Ew radihêje ala Iraqê ya li ser cenaze û bi histeriyak nedîti tevayê hêrsa xwe li ser vala dike. Wê dixe bin lingê xwe û tola ku nikare ji rejîme hilîne, ji wê alê hiltine. Yek ji

sehneyê ku bûye sedema polemikê ew sehneya binpêkirina ala Iraqê ye. Di aliye teknik û kişandinê de bi ya min ew ji gelek filmên Kurdi serketitir e.

Piştî xelasbûna film, amadekaran li ser piyan demekdirê li cepikan xistin û Hiner Saleem pîroz kirin. Derhênerê Kurd bi zimanên Kurdi, Ingilizî û Frensi spasiya herkesi kir û dirûşmeya "bijî Kurdistan" bilind kir. Her wiha wî di hemû hevpeyîn û axaftinên

xwe de spasiya Hikûmeta Kurdistanê, xelkê Kurd û tevayê alikaran dikir û hinek caran navê kesan ji rîz dikirin. Li ser pirsên rojnamevanan Hiner Saleem da zanîn ku filmê wî çirokek rastin e û ew bi tenê beşekî bicûk ji êş û azara Kurdan ya wê demê tîne zimên. Wezîrê Rewşenbirî yê Hikûmeta Kurdistanê Samî Şoreş ji di axaftina xwe de girîngiya beşdarbûna Kurdan ji bo wê organizasyona navnetewî anî zimên, pesnê serketina Hiner Saleem da û got ku ew weke Hikûmeta Kurdistanê amade ne piştgiriya hemû projeyên wiha serketi bikin.

Berî xelata Palmya Zérin, Hiner Saleem xelata "şovalye" ji destê Wezîrê Çandî yê Fransa wergirt. Wezîrê Çandî yê Fransayê Renaud Donnedieu di axaftina xwe de ji bo Hiner Saleem wiha got "welatê vî hunermendî bi Peymana Lozanê hatiye perçê kirin. Ew ji Kurdistanê tê. Em ji ber xebat û tekoşîna wî ya huneri, wî pîroz dîkin û em wî bi nîşana "şovalye" xelat dîkin".

Wê Mihrîcana heta 22ê Gulanê bidome. Roja 22ê mehê wê encamên mihrîcanê ji aliye jurî ve werin diyar kirin û wê yet ji 20 filmên berendam bibe xwediyê xelata Palmya Zérin. Hiner Saleem nexwest li ser wergirtina xelatê tiştekî bibêje, lê wî da zanîn ku ewê hertişte ku bi dest xwe ve bîne, diyarî gelê Kurd bike.

Derhênerê filmê Kilometer Zero Hiner Saleem di sala 1964an deli Başûrê Kurdistanê, li bajarê Akre hatiye dînyayê. Ji ber ku bavê wî pêşmerge bû, wî di zarotiya xwe de zorî û dijwariya jiyanê dit. Malbata wî ji ber zilma rejîma Seddam Hisen reviya Rojhîlatê Kurdistanê. Saleem di 17 saliya xwe de derketiye derveyî welêt û li İtalya xwendina xwe ya bilind kuta kiriye. Piştre ew derbasî Fransa bûye û meyla xwe daye ser sînemê. Wî heta niha 4 filmên bi metraja dirêj kişandine. Hiner Saleem ne bi tenê derhêner e, ew li gel karê sînemayê, nivîskarî û resamîye ji dike. Pirtûka wî ya bi navê "Tivinga Bavê min" di sala 2004an de hat weşandin û ji bo 20 zimanên biyanî hat wergerandin. Wî berê ji bi filmê xwe yê "Vodka Lemon" gelek xelat wergirtine.



Pêwendiyên Tirkîyê û Amerîka êdî nabe wek berê

Bêri ku Serokwezirê Tirkîyê Erdogan biçe Amerikayê li New Yorkê sempozyûmek balkêş lidarket.

Di sempozyûma ku ji aliye Komeleya Mimar, Mihendis û Zanyarên Tirk û Amerikî (MIM) ve hat organizekirin de Balyozê kevn ê Amerika li Anqerê Mark Parris axaftinek kir. Di axaftina xwe de Parris eşkere kir ku hevkariya stratejik a Amerika û Tirkîyê ber bi pêwendiyek nebaş ve diçe. Di sempozyûma "Pêwendiyên Tirkîyê û Amerikayê: Pêşeroja Şîrîkatiyek Stratejik" de Parris wiha got: "Hikûmeta li Tirkîyê armancêni ji yê Washingtonê cuda datîne ber xwe. Pêwendiyên Tirkîyê û Amerîka dikare xwes bibe, lê nikare bigihêje seviya xwe ya berê. Berê ji ber Sovyetê û piştre ji ber tehdîdên Seddam di nav herdu welatan de her liser bingeha ewlekariyê pêwendî hebû. Tirkîye bi artêşa xwe ya mezin ji bo şirketên Amerikî bazarek mezin bû. Lê pêwendiyên ku di seviyek taybeti de bûn, daktekin seviyek normal. Di vê yekê de tezkereya ku di 1ê Adara 2003an de ji meclisê derbas nebû bandorek mezin kir. Ticareta di navbera herdu welatan de jî kêm bû. Fîrmeyê Amerikî li Tirkîyê pêrgî astengiyan bûn."

Di sempozyûmê de rojnamevanê bi nav û deng Cengiz Çandar, ku li Tirkîyê çêtirîn rojnamevanê siyaseta derve tê pejirandin, jî axavî û got: "her du welat bi salan wek ku du şirkîn stratejik in tev geriyan. Lê pêwendiyek wiha tune bû." Her wiha pispora Nixon Center ya programên navnetewi yênerji û ewlekariyê Zeyno Baran di axavtina xwe de bal kişand ku Amerîka li herêmê mitefikîn nû wek Ukrayna, Bûlgaristan û Romanya peyda kiriye. Baran got: "Her çiqas Tirkîye încar bike jî, Amerîka li pêwendiyên Tirkîyê û Rûsyâ bi çavekî şîrîkatiyek stratejik e, dinirxine."

Gelek pisporêni siyasi û diplomatik di wê rayê de ne ku Tirkîye bi şik siyaseta Amerîka ya li herêmênu ku wê eleqedar dike, dinirxine û ji bo xwe telûke dibîne. Ji ber vê yekê berê siyaseta xwe dide ber bi Rûsyâ, İran û Sûriyê ku xwe ji xeteriya pirsa Kurd û Kurdistanê biparêze.

Amerîka leşkerên super amade dike

Navenda Lêkolinan ya Pentagonê DARPA li ser leşkerên ku metabolizmaya wan hatiye guheztin; bê xwarin, vexwarin û razan dikare hefteyekê şer bike, dixebyte.

Li gora lêkolîna ku zorê li sînorê mejiyê insen dike, ger lêkolîn di mijara guheztina metabolizmayê de encam bide wê bedena insen karibe xwe nû bike. Wek filimê fantastik wexta di şer de piyê leşkerekî jê bibe, wê pî carek din ji nû ve derkeve. Leşkerê birindar bi ramana xwe wê karibe xwîna xwe bisekinîne. Û ev leşkerên super wê karibin bê oksijen bijin. Di nav 20 sali de hêvî tê kirin ku ev bernama encama xwe bide.

Ji bo serdana Condoleezza Rice li Kurdistan û Iraqê vexwendinek bi lez



Lokman Berzencî

Wezirê Derve yê Amerîka Condeleezza Rice roja yekşemê şerdanek ji nişkêve û nepayî ji bo Kurdistan pêk anî û di havîngeha Selaheddin de bi Mesûd Barzanî re hevditinek çêkir.

Ya balkêş jî, balafira Xanîma Rice ji Qeterê rabûbû û ji ser paytexta Iraqê re derbasî Kurdistanê bûbû û piştî hevditina Barzanî, bi şûnve çûbû Bexdayê.

Herçend dema serdana Rice kurt bû ji, lê dîsa ji di naveroka serdana wê de wek siyasi maneyek gelek girîng dihewand.

Piştî hevditinê Rice, komcivînek rojnamevanî çêkir. Rice di vê komcivînê de carek din bi tundî dostanî û hevkariya Amerîka û Kurdan carî kir û piştevaniya Amerikayê ji bo Kurdan diyar kir.

Ev axaftina Condeleezza Rice, ji bo derûdorê Kurdistanê nameyek ronî û eşkere bû, ku Amerîka dostê Kurdane û bergiriya wan dike. Ev name bêtir ji bo hikûmeta Tirkîyê bû; ji ber ku ev demeke Tirk bi hênceta şerê PKK, leşkerên xwe dişine ser sinorê Kurdistanâ azad. Codeleezza Rice bi vê nameyê xwest bi Tîrkan bide zanîn ku divê ew dev ji mejiya xwe yê berê berdin. Kurdistanâ Başûr êdi ne wereseyê Osmanî ye, ku wekî berê li gorî keyfa xwe tékevin û derkevin.

Wek ku tê zanîn hikûmeta Tirkîyê ev demeke li hênceta digere, ku Partiya Demokratî Kurdistan ji bo alîkarîkirina gerillayêne PKK tawanbar bike. Di rastiya xwe de ev hênceten Tîrkan, nerast in. Diyare armanca hikûmeta Tîrkan a qirêj têkdana aramiya Kurdistanâ ye. Lê hemû planê qirêj a dewleta Tirk yek bi yek pûç bûn; bi taybeti jî şikestina mezin a "Cepheya Tirkûmani" ku ew dardestî MITâ Tîrkan bû û ji bo têkdana rewşa ewlehi û siyasiya Kurdistanê kar dikir.

Ji aliye din ev serdana Rice carek din bû hişyariyek ji bo serkirdayetiya siyasi ya Kurdan, ku rojek pêş de nakokiyê nav xwe rabikin û ji bo berjewendiyê Kurdistanê bibin yek; û ji bo van jî bilez kar bikin, ku Parlementa Kurdistanê vekin û rojek berê herdu idareyan bikin yek.

Diyare ku ev serdana Wezirê Derve yê Amerikayê, doza Kurdistanê xurttir kir û nehezen Kurdan pir nerehet û bêdeng kir. Êdî bi tenê pirsek dimîne ji bo serkirdayetiya siyasiya Kurdan: Gelo wê kengî Parlamenta Kurdistanê kom be û ji bo seranserê Kurdistanê hikûmetek bête çêkirin.

Dewleta Sûriyê ji dixwaze wek Tirkîyê bi hin guhertinê derewîn dinyayê bixapîne!

PK

Hikûmeta Sûriyê beriya Kongreya Partiya Bees a ku wê di meha Temûzê de çêbibe, dixwaze bi lez û bez hinek guhertinan pêk bîne. Tê gotin ku Hikûmeta Sûriyê ji bo diyarkirina hejmara Kurden bênasname, li Rojavayê Kurdistanê dest bi serjimartinê kiriye. Çavlîrêne ku hikûmet di kongrê de bîryara dayîna nasnameyên Kurdish wergir e. Her wiha tê gotin ku birêvebiriya Şamê dixwaze li gel mafê hemwelatiyê, mal û milkê wan Kurdên ku heta niha ji wan mafan bêpar bûn ji li wan vegeŕine.

Hat ragihandin ku rayedarên Partiya Bees di hefteya borî de li Hesiça, Serê Kaniyê û Til Temirê dest bi serjimartinê

kirine.

Hat gotin ku hikûmeta Bees li gel berpirsiyar û nûnerên rîexistinê Kurdan li Şamê civînek lidarxistîne û ji bo serjimartinê ji her rîexistinê nûnerék xwestine.

Wezîrê Plansaziyê yê Sûriyê İbrahim el-Derderi di daxuyaniyekê de diyar kir ku di 5ê Cotmeha sala 1962an de, di serjimartinê de şâşî hatine kîrin. Derderi da zanîn ku nasnameya 150 hezar Kurd di encama şâşîyekê de ji destê wan hatiye girtin.

Li gora Derderî wê di kongreya Partiya Bees de, li ser rakirina Zagonê Rewşa Awarte ji bê rawestandin.



Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav:

Navnîşan:

USA, Kanada û Austuralya

6 mehan: 70, € - Salekê: 120, €

Almanya:

6 mehan: 40,00 €

Salekê: 70,00 €

Commerzbank Bonn

V. Efe/Peyama Kurd

Konto: 1007947

BLZ: 38040007

Welatên Yekîtiya Ewropa

6 mehan: 60,00 €

Salekê: 90,00 €

Konto:

V. Efe/Peyama Kurd

IBAN: DE38 3804 0007 0100 7947 00

BIC: COBADEFFXXX

Ji bo welatên din têkiliyê bi rojnameyê re deynin.

Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany
Tel.: +49 (228) 18 00 654 - 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com

Hakimê dinê qedrê me digire, lê hinek Kurd qedrê xwe nizanin û bilûra dijmin lêdidin!

Bayram Ayaz

Roja 15ê Gulanê Wezira derive ya Amerîkayê xanim Condoleezza Rice hat Kurdistanê. Ew li Pirmam bi rê û merasimek fermî ji terefê Serokê PDKê birêz Mesûd Barzanî ve hat pêşwazî kîrin.

Şîweyê vê serdanê û pêşwaziyê, li gorî ziman û têgîhiştina peywendiyêni diplomatik ên navdewlî, seremoniyek fermî û dewlî bû. Berî ku C. Rice bê, Wezîrê Berevaniyê M. Rumsfeld ji li Kurdistanê bi heman şîweyî hatibû pêşwazî kîrin. Ferqa herdu serdanan ew bû, ku Rumsfeld berê hatibû Bexdayê û ji wêderê serdana Kurdistanê kîr, lê C. Rice ji Qeterê yekser hat paytextê Kurdistanê, Hewlîrê. Ji wêderê derbasî Pirmam bû, serdana M. Barzanî kîr kû gelê Kurdistanê çaverêye Serokatiya wî ya Kurdistanê ye.

Wateya vê serdanê û peyamên ku hatin dan, gelek zelal in.

Bi helwesta C. Rice û M. Barzanî, dostanî û heypemaniya Amerîkayê û gelê Kurdistanê carek din hat destnîşan kîrin. Ev seremoniya dewlî da diyar-kîrin ku Amerika bi awirek dewletî li Kurdistanê dinêre û bi Hewlîrê (Pirmam) re bi vî şîweyî dide û distîne.

Tevgera azadixwaza Kurdistanê kû iro bûye dewlet, êdi di prosesa demokratizekirina, Rojhilata navîn de faktorek esasi ye. Bê Kurdistan, İraq nikare bibe welatekî demokrat! Ü eger li İraqê demokrasî bisernekeve, plurîlîzm bisernakeve, wê demê wê globalîzm li Rojhilata navîn têk biçê. Ev tê wê wateyê ku wê berê dîrokê bi hêlek din ve biguhere. Ev tişt ne mumkin e. Hinek aqilsivik carna behsa şerê Vietnamê û têkçûna Amerîkayê dikin. Bi taybetî cepen Tirk, Kemalist û Tirkîci van gotinan dikin û hêviya xwe bi van çirokan tînin.

Ev «hîzîr», hîc û pûc in. Salêن şesti û hefteyî rewşek din bû, iro konjonturek din heye. Di warê siyaset û sîste-ma navnetewî de bedêl (alternatif) ji bo globalîzmê tune ye. Ji hêzên sereke yên navnetewî ji hîc ti hêz li dijî globalîzmê nîne. Globalîzm wê roj bi roj bi cîh bibe û yek ji aktorên herî girîng gelê Kurdistanê ye, tevgera azadixwaza Kurd e.

C. Rice yek ji pisporê nav û deng yê sîstem û bir û hîzra globalîzmê ye. Giraniya C. Rice di birêvebiriya DYât de tê zanîn. Ew di nav koma hevalêni li dora G.W. Bush de siyasetvanek xwedî vîzyon e û Bush zêde qedrê wê digre.

Gelek Serokdewlet û wezîren biyanî li dû wê ne daku qewlê hevdîtinek an serdanekê jê werbigrin. Eger iro hakimê dinê Amerîka ye, -ku ev yek bêguman e- C. Rice ji ew kesayet e ku peywendiyêni navnetewî birêdixe û di dizayna siyasi ya herêmên stratejik de rolek xwe ya esasi heye.

Ev kesayeta birûmet serdana Kurdistanê dike. Di bin «ala qedexe», yanî di bin ala Kurdistanê de guh dide sirûda netewî Ey Reqîb. Di ser xaliçeyâ sor

de ya ku li ber lingê wê hatibû raxistin, bi serokê vî mileti re bi hevre dimeşê û hêza şerfê silav dike. Bi qasî saetekê li gel hevdu hevdîtinê dikin, piştre bi hevre konferansekê rojnamevanî lidardixin.

Evet, ya ku rola wê di dizayna Rojhilata navîn de sereke ye, dibêje:

“Barzanî hekim e, ez hatime guh bidimê”.

Belê, ev gotinek dîrokî ye û işareteta rola “hekim” ya dîrokî dike.

Ez dibêjim, prosesa dewletbûna Kurdistanê ji wek prosesa globalîzmê ye, êdi jê vege tuneye.

“Hakimê dinê” van gotinan dike û “hekim” ji ditine, yanî evê ku vî derdî derman bike!

Gotinek me Kurdistan heye, dibêje: Cihê hakim û hekim lê nebe, jiyan li wêderê heram e!

Vêca em dikarin van gotinan bi-qlipînin, bêjin: Cihê hakim û hekim lê hebe, jiyan xweş e û ew welat ji bîhuşt e.

Kurdistan wê bibe bîhuşt, bibe wek Berlîna Rojava ya dema şerê sar. Ewê bi her awayî û di hemî astî de bibe nimûneyek berbiçav ji bo derdorê xwe, ji bo ew dewletêni ku dest ji otorîterîzmê û teokratîzmê bernadin.

Sed mixabin... Gelek rîexistinê Kurd hêj di tênegîhiştina vê rastiyê de ne, nabînin, gelo berê dîrokê bi kûderê ve ye! Tew hinek Kurd li bakurê welatê me dijminahiya Dewleta Kurdistanê dikin. Ev hêz nêrinê dewleta Tirk di nav Kurdañ û Kurdistanîyan de belav dikin.

Li Rojhilata navîn di konjonktura iro de kê dijminahiya Amerîkayê û di-jayetiya prosesa dewletbûnê li Başûrê Kurdistanê bike, hevalê dewleta Tirk e û piştgiriya hemî statûkoperestêñ herêmê dike.

Tevgera Kurdistanê, divê ji bandora van nêrinê çewt û bi tehlûke rizgar be. Ji bo vê yekê ji divê berî her tişti li bakurê welatê me tevgerek xurt bête rîexistin. Partiyêni me yên ku li gor ya-sayen Tirkan illegal in, ew ji divê xwe xurt bikin. Bi taybetî PDK-Bakur divê xwe vejîne. Her wisa û bi taybetî, divê tevgerek hevdem, yasayı, sivil, demokrat û girseyî bê wicûdê. Tevgerek ku mohra terorîzmê liser tunebe û benikê wê di destê dewleta Tirk de nebe! Divê welatperwerên demokrat rola xwe bilîzin. Kurdistan li benda rûdanek siyasi û rîexistinê wisa ye. Nabe, Newrozê Amedê di bin siya xeteke ne Kurdistanî de bê pîroz kîrin!

Divê em bi her awayî di emrê prosesa dewletbûna Kurdistanê de bin. Vê prosesê ticarî istîsmar nekin û nehîlin ku keysperestêñ ku ji bo berjewendiyêni xwe yên şexsî hewl didin hin rewşan istîsmar dikin, biserkevin. Divê em hîc rê nedîn ku ev kes û hêz, van tiştan bikin û bikarin bêjin “kumê min li serê te!”

Xurtkirina tevgera azadixwaza Bakurê Kurdistanê, ji bo me erka sereke ye.

Ewrûpa piştgiriya Evdila Öcalan dike

Ahmet Zekî Okçuoğlu

Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpayê biryar da ku dadgeh-kirina Evdila Öcalan ne dadraşt e. Li gorî prensibên dadê, ev biryara Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpayê di cih de ye û di warê dadî de kes nikare li dijî vê biryare tiştekî bêje. Lê di daweyêni siyasi de, bi taybet jî wek di daweyêni Öcalan de ku daweyek gelek mezin e, meriv nikare bêje li ser dadgehkirinê tu bandorek siyasi çenabê û dadgeh tim biryara xwe bi tenê li ser dadmendiyê ava dikin.

Meriv piçek ji siyasetê û dadmendiyê fam bike pir baş dizane ku di daweyêni siyasi de, bi taybet jî daweyêni wekî yê Evdila Ocalan de destê siyasetê tim li ser destê dadmendiyê de bûye. Him di dadgehkirina Evdila Öcalan ya Tirkîyê de, him jî ya Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpayê de di avakirina biryare de rola diyarker ya siyasetê bûye.

Ü disa meriv bitûni li vê bûyerê binêre di vê dawê de tiştekî balkêş jî ev e: Her çend biryara Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpayê li dijî biryara Dadgeha Ewlehiya Tirkîyê de be jî, di eslê xwe de her du biryara xizmetê armancek hevbeş ya siyasi dike, ku ev jî ev e: Evdila Öcalan di rojeva Kurda de hiştin... Desthilatdariya wî ya li ser Kurda paraztin...

Li dijî biryara Dadgeha Ewlehiya Tirkîyê, Dadgeha Mafê

Mirovan ya Ewrûpayê biryara xwe li ser sê binasiyan ava dike. Di heyeta dadrêsen dadgehê de hebûna endamek leşker; dirêjbûna veprisina polis; bisînorkirina hevdîtina Evdila Öcalan û parêzgerên wî.

Dadgeha dewleta Tirkan pir bi rehetî dikaribû rê nede van bêdadiyan. Weki minak, dikaribûn di serî de zagona xwe biguhêrin û dadrêsa leşker ji pêvajoya dadgehê derxînin. Lê bi zanîn piştî çend rûniştinan zagona xwe guhertin. Weki dinê ne hewceyî dirêjkirina veprisina polis bû. Öcalan di hatina xwe de, hê di balafirê de gotibû, "Ez di xizmeta dewletê de me." Gotina xwe jî anîbû cih. Berjewendiya dewleta Tirkan ji berpirsiyaren wê bêtir diparast. Teştekî ku Evdila Öcalan ji wan vêşartibana tune bû. Ji derveyî veprisina polis dikaribûn hertişî jê bipirsin. Weki dinê bisînorkirina hevdîtina wî û parêzgerên wî jî tiştek bêmane bû.

Di pêvajoya dadgehkirinê de bi zanîn ev xeletî hatin kirin. Siyaseta Tirkan a liser Kurdistanê liser Evdila Öcalan hatibû avakirin. Tirk bi destê Evdila Öcalan navenda Kurdistanê girtibû bin kontrola xwe. Di gel vê disa bi saya wî, Tirk dikaribûn dest bavêjin pêvajoya netewiya tevahiya Kurdistanê. Piştî anîna Evdila Öcalan a Tirkîyê û parastina wî ya Kemalizmê, bivê nevê kontrola Evdila Öcalan liser Kurda ber bi kembûne ve çû. Wusa ku, hêdi hêdi di nava PKK de jî li dijî wî pêlek mezin radibû. Bi gotinek din Öcalan têk diçû. Têkçûna Öcalan, têkçûna siyaseta dewleta Tirkan a Kurdistanê bû. Piştî hatina wî ya komara Tirkîyê, têkiliya Evdila Öcalan û rîexistina wî, li ser parêzgerên wî hatibû avakirin. Heke dawî li pêvajoya dawêbihata, di warê dadmendiyê de wê dawî li karê parêzgeran

jî bihata, ku ev jî dibû sedema hilweşandina mekanizmaya ku li ser parêzgeran hatibû avakirin.

Liser mijara Evdila Öcalan di nav dewleta Tirkan de du fîkrîn jihev cuda hebû: Ya yekê, digotin bi metodê kevnî diji Kurdan şer kirin, ji bo berjewendiya me xeter e. Bi destê yekî Kurd em netewe-parêziya Kurd bigirin bin kontrola xwe, çetîr e. Evdila Öcalan liser vê projeyê di 1975an de derxistin siyasetgehê û bi destê wî di nav hêzên Kurdan de şerek navxweyi derxistin. Piştî derba leşkeri ya 12 İlône bi piştgiriya Sûriyê (Bêşik di binê vê de bi awayekî têkiliya Tirkan û Sûriyê hebû.) Evdila Ocalan li Kurdistanê şerek kontrolkirî derxist. Dûvre dagirkeren Kurdistanê yê din jî li ser proja Evdila Öcalan bi Tirkîyê û Sûriyê re lihev kirin û bi saya vî şeri ne bitenê Kurdistanana navend û perçê Kurdistanana Sûriyê, herdu perçeyen Kurdistanê yê din (Iraq, Iran) jî, bi nîşpetek mezin ket bin kontrola Evdila Öcalan. Hindî de bi kontrolê de be jî ev peşdeçûna Evdila Öcalan cavê beşek nijadperesten Tirkan ditirsand. Digotin, "Ew Kurd e û piraniya Kurda li dora wî civiyane. Dibe ku iro em wî kontrol bikin, lê garantiya vê tune ye. Gumane ku sibê hêzek ji me jêhatitir dest bavêje û wî bigire bin kontrola xwe û bi destê wî Kurdistanê ava bike. Bi gotinek din wî Kurdistan bi destê me bê avakirin. Jiber vê yekê proja Evdila Öcalan bi êgir re leyistin e. Divê ev proje bê iptal kirin, Evdila Öcalan jî ji holê bê rakirin.

Ji bo ku derdorêni li dijî proja Evdila Öcalan di nava dewletê de bêne qanekirin, piştî anîn û dadgehkirina wî, bi navê Komara Demokratik" Komara Tirkîyê û netewepe-restiya Tirkan (Kemalizm) bi

wî dan paraztin. Hêzên li piştî Evdila Öcalan bi vê biserketin, piraniya dijberên xwê li ser vê projê qane kirin; yê mayî jî bêdeng hiştin.

Lê ji aliye din ve ev helwes-ta Evdila Öcalan tesîrek gelekk negatif liser Kurdish kir. Hêviya bi milyonan Kurdish ji wî şikest. Endamên rîexistinê wî yêti ku bi salan bi serê wî sünd dixwarin qefle bi qefle ji wî reviyan. Ji bo pêşîya têkçûna projeyâ Evdila Öcalan bigirin diviya hinek guhertin bihatana çêkirin. Sedema ji nuhve dest-pêkirina şer yek jî ev e. Li ciyê "Komara Demokratik", "Kon-federalizma Demokratik" hate daniştin. Dadgehkirina dudoyan jî yek ji van tedbiran e. Wek li jor jî me got, dadgehkirina yekê ji bo qanekirina nijadperesten Tirkan bû. Wê sedema dadgehkirina dudoyan jî, ji bo jî nuhve qanekirina Kurdish be. Di dadgehkirina yekê de Evdila Öcalan wek pisikekî bû. Wusa xuyaye içar wê wek şerekî be.

Em bêni ser di projeyâ Evdila Öcalan de rola Ewrûpiyan.

Evdila Öcalan ne bitenê hêviya dagirkeren Kurdistanê ye, hêviya Ewrûpiyane ji. Da-girkeren Kurdistanê ji bo ku dadirkeriya xwe bidominin, wî bikartînin. Ewrûpi jî ji bo ku kontrola Amerîkayê ya li ser Rojhilata navîn têk bikin, wî bikartînin.

Ditinek çavdêran a hevbeş ev e ku, ji nuhve dadgehkirina Evdila Öcalan wê bibe destpêka pêvajoya berdana wî. Dewleta Tirk di serî de dizanibû ku ev dawe wê jiber van sedeman li Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewrûpayê vegere; lê disa jî bi zanîn ev xeletî hatin kirin. Ü

bist û hêst salin ku Kurda Evdila Öcalan radîzen û bi Evdila Öcalan radibin. Ev ne ji qabiliyeta Öcalan tê, ji hêzên pişt wî tê. Wê ev bûyer hê çend salan bidome kes nizane.

Bi vê qûşê em nagihêñ Müşê

Rêber Mihemed

Kurdên Kurdistanâna Tirkîyê li benda Pêxemberekîne, ku bê û wan ji-bin zilm û zorê derêxe! lê mixabin piştî Hezretî Mihemed wehî qut bûye, jiber ku Hezretî Mihemed Pêxemberê talî bû li dînyayê. Hergava serokê welateki diçê Tirkîyê, çav û guhê milletê Kurda lîye ka wê li ser wan ci bêje, ka wê ci mafan ji hikûmeta Tirkîyê ji wan re bistîne û ev taze hate xuyakirin dema ku Gerhard Schroder hat Tirkîyê. Lê Gerhard ne behsa Kurda kir ne jî Wezîrê wî Yoşka Fisher navê Kurda anî ser zimanê xwe, lê behsa Ermenîyan kirin û behsa gelek problemen aborî û siyasi li Tirkîyê kirin. 20 milyon Kurdên li Tirkîyê, li xwe ma ecêbmayı gelo çîma kesek ci hisaban ji wan nake?

Roj bi roj mesela Kurda li Tirkîyê beraveti dibe, û Kurd gavê berûpaş tavêjin. Daxwazên Kemalistan li pêş dikevin û dicin serî. Kurden ku li Tirkîyê behs û qala Kurdayetiye jî dikan, ew jî behs û qala Kurdistanâna Iraqê ye. Heger mesela Kerkukê beyan jî mesela Federalîye be, wileh kezeba mirov dişewite gava ku Ewrûpi û Amerîki û dînya hemî ci hisaban ji mirov neke, lê li ser şerpa Merve Qahweci hetka Tirkâ û Dîmoqratiya wan birin.

Tiştê balkêş jî niha Kurden Kurdistan Tirkîyê, li hêviya hatina Mam Celal in (serokê Iraqâ federal), ka wê ci li ser Kurda bêje? Heger mirov xura serê xwe nexurîne, kesek ji mirov re xura serê mirov naxurîne. Gelo ci dezgehê navnete-wî û insanî nînin ku Kurden Tirkî karibin hewara xwe bigihînîne? Gelo zana û pisporê vî milleti kanîn? Gelo ev ne welatê Şêx Seidê Piran, Seyid Riza û Ihsan Nûri Paşa ye? Yan Kurden Kurdistanâna Tirkîyê bî vê rewse razîne? Yan jî bâwérie milleti bî mezlûmîyeta wî û bindestiyeta wî hayê? Ma prensipen Kemalizmê li gorî daxwazên milletê Kurdin? Heyf, heyf û xebînet ku bi qasî şerpeyekê jî qîmetê Kurda (li Kurdistanâna Tirkîyê) li dînyayê tune ku hinek behsê bikin! Gotinek Kurda heye dibêje : Bi vê qûşê em nagihêñ Müşê!



Radîkalkirina Rêxistinê Îslamî yêni siyasi



Ömer ÖZMEN

Di qada navnetewî de rêxistinê Îslamî yêni radikal, ji du serkaniyan xwinê digerin. Ji van serkaniyan yek, Arabistan a Sûûdi ye. Rêxistinê radikal, yêni xwediye referansa Wehabî /Selifiyan diparêze û finanse dike. Serkaniya duyemin, Komara İslamiya Iranê ye, rêxistinê İslamî yêni radikal ku, mezhebê Şia referans girtine diparêze û finanse dike. Ji derveyî van herdu navandan, li Tirkîye ji, bi qasî du hezar teriqet, cemaat û komeleghen piçûk çalak in. Ev saziyen İslamî, ji salên 70 yî yir de, di nav konsepta, "Türk islam sentezi" de xwediye toleransa rayedarêne dewletê ne.

Ji sazî û dazgehêne dewletê yêni aborî (KIT) istifade dikin. Di bin navê weqfan û qursê Kur an e de, bi awayekî nijadperest û olperest têne perwerde kirin. Hinek ji van grubê İslamî yêni wek Hizbulâh, ji bo ku li dijî muxalefeta Kurd hatine bikaranîn, ji terefê hêzên ewlekariya dewletê ve hatine xurtkîrin û bi organizasyonê İslamî yêni herêmê re hevkari pêkanine. Hêzên dewleta Tirk, ve hevkariya wan û rêxistinê İslamî yêni radikalê navnetevî teşviq kiriye, yan ji tolerans nişanê wan daye. Tê, zanîn, gelek hemwelatiyê Tirk, li Çeçenistanê, Bosnayê, û Iraqê çalakiyê teröristi bikaranîne.

Balkese, radikalîzékirin û terörizekirina rêxistinê İslamîk, pişti hilweşandina sistema sosyalist deştپêkiriye. Çimki; di dema şerê sarde, di coxrafya İslamî de dewletê otorîter û totalîter, di bin hegemonya herdu blokan de desthilatdariya xwe, bi misogeri meşandine. Rejimêne wek Irak, Sûriye û Yemen e, di bin parastina Yekitiya Sovyetê de di domîyan. Tirkîye, Iran, Urdun û Arabistana Sûûdi ji, di bin parastina Amerikaniyan de dihatin domandin.

Dema şerê sar qediya, ev dewletê otorîter û totalîter, li hember pêlén gorankariyê û veguhertinê cihanî, rejimêne xwe di metirsîyê de ditin. Ji bo ku desthilatdariyê xwe bimesînin, li dijî Dewletê Rojava yêni Demokratik û muxalefetê navxweyi, ola İslamî, ji xwe re xistine siper û wek çekêne ideolojik teröre dikin.

Bingehêne mezheba Wahabî, ji terefê Muhammed Bin Ebdülwahab ve, di sedsala 18. an de hatiye avêtin. Nirxandina ola islamî ya heri fanatik e. Referansa wî, Dar ül Harb e. Hetta rawestandina şerê sar, di nav gelemperiya Misilmanan de mezhebekî heri marjinal bû. Ji bo ku, qerekterê wî yê monolitik, bi gora bir û hizrê dewletê diktatorial e, di nav çend salan de hat xurtkîrin û navnetewî kirin.. Ger ne alîkariya van dewletê diktatorial bûya, xurtkîrin û navnetewîkirina vê mezhebê, di demekê ewqas kurt de, weki di, bi ci awayi tê şirove kîrin?

Tê ditin ku, rêxistinê terörist yêni navnetewî, ji dewletê herêmê yêni otorîter an nîv otorîter alîkarî distin. Ev alîkari, bi awayek legal an illegal, di warê istixbarat, lojistik, ikmal û iaşê de tê meşandin. Ne ev alîkariya bin, tu rêxistinê terörist, nikare li ser lingan bisekine û çalakiyê teröristi bidomine.

Eşkere tê ditin ku, ji salên 90 û vir de, li dijî navenda siyasi û leşkeriya dewletê herêmê yêni totalîter-nîv totalîter, tu çalakiyê teröristi nehatiye bikaranîn. Di heman demê de, hemi çalakiyê teröristan li dijî Dewletê Rojava yêni Demokratik, Gelê Cihû û muxalefeta Kurd hatine bikaranîn.

Ew dewletê ku, bi armanca "dij Kurdayetiye" bi hevdû re hevkari çêkirine, di heman demê de, bi rêxistinê İslamîperesten radiqal re ji, têkildarin.

Ji van têkiliyan, çend mînakên ku di çapemeniye de cîh girtine, wehane:

Li gor rapora bi navê "ANALIZA STRATEJİK" ku, ji terefê istixbara-

ta polisên Oslo yê ve hatiye amadekirin, di 17.meha İlonê 2002 an, heta sala 2004 an, ji Serokê Rêxistina İslam El Ensar è Mele Kraker re, 18.milyon kron perê Norveç ê, li ser Komara Tirkîye re hatiye bi rêkirin. (Özgür Politika - 05.02.2004)

"Damezranvanê Rêxistina "Ixwanê Muslimin" a Sûriyê, Prof. Mahmud El Savvaf, di sala 1992 an de, li Stenbolê, qeza Yalova yê bi cîh bûye. Ev kes, di herêma Marmara yê de, qampê İslamîperestan û qursên Kur'anê damezirandiye. Bi istixbarata Tirk re kar dike." (Serkani : Faik Bulut-Rêxistinê İslamî. Rûpel : 326)

Di komara İslamî ya Iranê de, bi armanca ixfordikirina şoreşa İslamî, di bin navê "Hêzên Quddus" de, ji bo herêmê cihanê, 8 heb Midûriyet kar dimesînin. Tenê ji bo İslamîperesten Tirkîye, 2 heb Midûriyeten taybetî hene. Berpirsiyare van herdu Midûriyetan, cîgirê Wezirê Parêzgeriya Şoreşê, Kemal Hidayet e. Navenda perwerdeyiya vi şaxê Tirkîye, li bajarê Urmîyê tê zanîn. (Serkani : Faik Bulut-Rêxistinê İslamî, Rûpel : 491).

Bi kurtahî, di nav Rêxistinê İslamîperesten terörist û dewletê "dij Kurdayetiye" de hevkari pêkanîne û peywendiye simbiyoz heye. Armancê wan yek in.

Armancû hedefêne wan:

1- *İdeolojiya İslamî ku, di Rojhilata Navin de bingehêne xwe xurt e, wek siperâ ideolojik bikarbinin û dinamikên demokratik-bûne berteref bikin.*

2- *Dewletê Rojava yêni Demokratik, bi rebazên terörmê bênen westandin. Bi vê wateyê, berfirehbûna gorankariyâ cihanê, ji herêmê bidin dûrxistin û desthilatdariya diktatoriya xwe, dirêj bikin.*

3- *Statuya Gelên İslail û Kurd, ji bo ku, ji demokratizebûna herêmê re model teşkil dikin, ji holê bidin rakirin.*

KOMKUJIYA ERMEÑIYAN

Lokman Polat

Li ser qetliama Ermeniyan gelek nivîs û pirtük hatine weşandin. Hinek Ermeniyan ku di dema qetliamê de jiyabûn, biranîn xwe nivîsine û biranîn wan weke pirtük hatine weşandin.

Komkujiya ku ji ali dewleta Osmanî ve li li dijî Ermeniyan di sala 1915-an de pêk hatibû ji ali temamê dinê -cihanê- ve tê qebûlkirin. Ev komkuji tenê ji ali komara Tirkîye ve nayê qebûl kiran. Dewleta Kemalist dîrokê li gor direwan nivîsiye û di dîroka wan de "komkuji" (!) tune.

Nivîskarê navdar Orhan Pamuk got "Tirkan miyonek Ermeni û sîh hezar Kurd kuştine." nijadperest û şovenen Tirk li hember wî qiyamet rakirin. Orhan Pamuk kuştina Kurdan ya panzdeh salêndawî anî zimîn. Ji serhildana Şêx Seîd nemir heta dema niha bi sedhezar Kurd ji ali hêzên dewleta Kemalist a Tirk ve hatine kuştin.

24 Nisanê roja bîranîna komkujiya Ermeniyan e. Di vê rojê de Ermeniyan cihanê kuştîyên xwe bi bir tînin û naletê li dewleta Tirk tînin. Serokdewleten Ewropa û Amerikayê ji di roja 24-ê Nisanê de beyan didîn û li hemberî komkujiya Ermeniyan derdikevin. Fransa, Almanya û gelek dewleten din komkujiya Ermeniyan bi jenosîte binav dikin. Ez ji peyva "komkuji" yê di vê nivîsê de bi maneya "jenosid" e bikar tînim.

Dema roja 24-ê Nisanê nêzîk dibe rayedaren dewleta Tirk, masmedia wan û hemû birêvebirêne dewleta Kemalist a nijadperest ditirisin ku ka gelo dê serokê Amerikayê ji bo kuştina Ermeniyan jenosit bibêje yan na. Di 24-ê Nisana isalîn de serokê Amerikayê Bush got: "Ew roj rojeye reş e. Felakteke mezin e." Maneya felaketa mezin ev e ku ew roj bûyereke pir xirab pêk hatiye û qetliam çêbûye." Vêca keyfa birêvebirêne dewleta Tirk û masmedia Tirk hat ku Bush gotiye "Ev felaketa mezin e." Ü negotiye jenosit e. Bush isal negot, dê saleke din bibêje. Ji xwe dê demek bê ku êdi dewleta Tirk nikaribe komkujiye înkâr bike û neçar bimine ku qebûl bike. Xwînxwarê komkujiya Ermeniyan Sa-drazam Talat Paşa di dema komkujiya Ermeniyan de ji kijan bajaran çiqas Ermeni kuştine, sîrgûn kîrine di deftera reş de nivîsiye û ew deftera wî ya reş iro derketiye hole. Ji xwe gelek belge hene ku dide ispatkirin bê mîyonek Ermeni hatine kuştin.


Hinek komkujiya Ermeniyan dîkin stuyê Kurdan û daxwaz dîkin ku Kurd ji ji Ermeniyan doza lêborînê bikin. Yê ku fermaña kuştina Ermeniyan derxistiye Kurd nebûne, dewleta Osmanî bûye. Bi emir û fermaña wan û ji ali ordiya wan ve Ermeni hatine kuştin. Di hinek cihan de heger alayen Hemîdi ji bi ordiya Osmanî re Ermeni kuştine, ev nayê vê maneyê ku Kurdan Ermeni kuştine. Alayen Hemîdi ji ali dewletê ve hatiye damezrandin û di xizmeta wan de bûne. Lewre ji ji komkujiya Ermeniyan Kurd berpirsiyar nînin. Ordiya Tirk li Qibrîsê ji qetliam pêk anî û di nav leşkeren ordiya Tirk de Kurd ji hebûn. Kes kare bibêje ku Kurdan li Qibrîsê qetliam pêk anî? Desthilatdariya Kurdan tune, xwedî biryar Tirk bûne û wan fermaña daye û ordiya dewletê ji komkuji pêk anîye.

Di dema komkujiya Ermeniyan de gelek Ermeni bi xêra Kurdan ji qetliamê, ji kuştinê xilas bûne. Di şûna ku Kurd ji Ermeniyan bexşandin bixwazin, dive Ermeni ji Kurdan re spas bikin ku gelek Ermeni bi xêra Kurdan ji mirinê xilas bûn û jîyana xwe domandin.



Ne tenê li Tirkîyê, li Hollandayê jî axaftina bi zimanê Kurdî qedexeye

Huseyîn Baybaşin ji ber vê yekê 6 salan nikaribû bi diya xwe û zarokên xwe re bi Kurdi bipeyive. Ji ber ku diya wî Tirkî û zimanê Ewropî nizane Huseyîn Baybaşin nikaribû bi diya xwe re bipeyive, ewana mîna girtigeha Amedê ya dema Esat Oktay Yildiran, dikaribûn tenê li hev binêrin.



PK - Huseyîn Baybaşin di sala 1998an de hatibû girtin. Ew ji sala 1998 heta 2004an 6 salan li bajare Hollandâ VUGHTê di girtigehet bi navê EBî (Girtigeha ji bo kesen ku cezayê giran girtine û ji bo dewletê talûke ne) de ma.

Ew girtigeh di dema şerê cihanê yê duymen de wek wargeha civandinê hattîye bikaranin. Niha jî her roja şemiyê cihû li vir ibadet dikan.

Huseyîn Baybaşin 6 salan di vê girtigeha EBî de nikaribû bi ziyaretçiyen xwe re bi Kurdi biaxife. Diya wî çend caran hat ziyyareta wî, lê wan nikaribûn bi hevdu re bipeyivin, çimkî diya wî xeynî Kurdi bi tu zimanî nedizanibû. Ev rewş dema cuntaya 12 Ilonê, girtigeha Diyarbekirê tîne bîra mirovan.

Ji ber ku zimanê Kurdi hatibû qedexekirin name û kartpostalên kurdi ku dosten wî ji wî re dişandin, rîvebirê girtigeh nedidan wî. Ew nikaribû bi zaroßen xwe re ji bipeyive.

Li gor iddiaya rîvebirê girtigeh zimanê kurdi ne li gorî standartên Ewropayê ye.

Huseyîn Baybaşin li hemberi vê qedexekirina zimanê Kurdi di sala 1998an de 15 rojan û di sala 2000an de ji 21 rojan ket greva birçibûnê.

Dîsa Baybaşin di sala 2001an de ji bo rakirina vê kiryarê serî li Dadgeha Mafêni Mirovan ya Ewropayê (DMME) da. Lî heta iro ev dawe bi dawî nehatiye.

Parêzger Huseyîn Baybaşin *Adela Wanderplatz* di vî mijari de wiha got: „Rîvebirîya girtigeh ji min re got ku, ji ber ku wergerê zimanê kurdi tune, em nikarin destûra bi kurdi axaftinê bjin.“

Lê ev gotinê rîvebirîye ne di cih de ye. Ji ber ku li Hollandayê bi hezaran Kurd dikarin wergervaniya dê û zaroßen Baybaşin bikin.

Ji bo Baybaşin bi tenê axaftina zimanê dayika wî nehat qedexekirin, ji ber ku ew bi kurdi peyivî ji aliye dadgehê hat

cezakirin.

Parêzger *Adela Wanderplatz* dipirse; bi zimanê kurdi axaftinê Huseyîn Baybaşin di telefonê de ji aliye dadgehê hatin wergerandin. Ji bo axaftinê telefonê dikarin werger bibinîn, çima ji bo girtigeh nikarin bibinîn?

Pêwendiyen Huseyîn Baybaşin bi çapemeniyê re hatiye qedexekirin. Ji ber ku Huseyîn Baybaşin Kurd e. Heta niha çend televizyonen biyanî û Hollandî xwestin pê re hevpeyvin çebikin, lê rî nedan wan. Ji ber ku Huseyîn Baybaşin Kurd e.

Yek ji wan televizyonan, televizyonan Hollandê „National“ e. Demek berê du rojnamevanen „National“ xwestin Huseyîn Baybaşin bibinîn û li ser wî bernamyeck amade bikin, lê midûrê girtigeh destûr neda. Ji ber ku Huseyîn Baybaşin Kurd e. Huseyîn Baybaşin ji bo vêya ji seri li dadgehê da, lê bi salane dawe dom dike.

Parêzger *Adela Wanderplatz* di derbarê vê mijarê de wiha got: „Ev ne bîryarek dadraست e. Rîvebirê girtigeh iiddia dikan ku gava Baybaşin bipeyive, wî li derive bêaramî çê be. An ji pevcûn çê bin.“ Lî *Adela Wanderplatz* iiddia dike ku di eslê xwe de sedem ne ev e. Rîvebirê Dewleta Hollandê naxwazin Baybaşin bipeyive. Ji ber ku axaftinê wî nerast hatibû tercumekirin û ew ji vêya ceza xwaribû. Gava ew bipeyive û şâşitîyen wan eskere bike, wî polisê Hollanda bikeve tengasiyê. Ji ber vê ew naxwazin di navbera Baybaşin û çapemeniyê de pêwendî çebibe.

Huseyîn Baybaşin wiha dibêje: „Ez di nav rewşek pir xirab de me. Ez di naven de Ewropayê de nikarim mafêni mirovatî yê herî biçük ji bikar bînim. Çima parêzvanen mafêni mirovan li hemberi vê neheqiyê bêdeng dimînin? Ma qey ez ne însan im?! Çima réxistinê Kurdan li min xwedî dernakevin?! Ma qey ez ne Kurd im?!“

Bi teoriyên marjînal Kurdên fîction

Zarokek ji diya xwe dims û mast dixwaze.

Herdyan linav hev dixe û di peyde jî digri.

Diya wî jê dipirse; çima digri?

- Ez dixwazim tu mast û dimsa ku min linav hevdü xistiye ji hevdü biki!!

Kadim Kan

Ez nizanim bala we dikşîne yan na, A.Öcalan di her hevditina xwe de bi pirtûka ku di destê wi de ye derdikeve. Herkes zane ku bi vî awayî êw saloxdana wê pirtûke dide.

Hema bêjin her beyan û gotinê A.Öcalan di wan rojan de girêdayî xwendina wê pirtûkê ye.

Eger Murray Bookchin dixwine, morîk û mircanên xwe yê zérîn li ser ekoloji û rîvebirê mehalî pêşkêsi „parêzgehê“ xwe dike. Ü dibêje „dewlet ne tenê ji bona idarekirina civakê ye, ew li ser wê sistemek zorêye ji „ji bo vê ez dewlet naxwazim.“

Wek anarîstekî ku li himber hemû testhilatî, hîyerarşî û serdestiyê ye. Lî belê ne li himber desthilatdariya dewlet û hebûna dewleta Tirkâ ye. Ji aliye din ve, ne li himberi hîyerarşîya nava PKK ye, û li hepisxanê! Ew xwe bixwe wek serokê konfederalizmê ilan dike!!

Heyranê K. Ataturk e ku bixwe diktatorek, nijadperest û heta mirina xwe ji „tek şef“ bû.

Xuyaye qistasê anarîzma Marxist ji bo hînek xalan derbas nabe!!

Teoriya „konfederalizm“ û wek strukturek civakek demokratik ji ali M. Bookchin ve di gelek pirtûk û nîvisandinan de hatiye teorize kîn. Ew van dîtinan wek fîkrê xwe pêşkêsi Kurdan dike. Lî belê naxwaze bêje ku M. Bookchin liser hebûn û pêşketina kultura netewî û grûpê etnîkî ji dîtinin wi yê pozitîv hene û tawîzkar nîne.

Eger Antonio Negri û Michael Hard bixwine-pirtûka şahînsah- çawa Dewleta Amerika û arîstokratiya finanscapital li cihanê mirovatiyê kontrol dike û ji bo wê ji gereke mirov li himber hemû cûrê dewletê be. ((lê ne li himberi dewleta Tirkâ)) „Ji bona ku globalisering li cihanê bi awakî rîeznezanî liser sînorê dewletan belav dibe, xwestina heqê netewî û avakirina dewletê ji bo netewekî tişteki bêmane ye“

„Ji ber ku dewlet ne tişteki konkret ku bi hebûna netewe ve rîvebirîye, ew tenê çeket ji bo zilm û zorê ye.“ Bigerin ber çav ku A.Öcalan vê teoriyê ji bo Kurdan wek çara yekemîn dibîne. Eger A.Öcalan bigota „Dewleta Tirkân, a Bosnaliyan, a Azeriyan, a Farisan û 21 Dewleten Ereban, Almanan û Fransiziyan gereke tunebin“. Ez dibêm qey wê devê wî rîvebirîye û wê wî bavetana nexweşxana psîkolojiyê. Lî gava ku dibêje desthilatdarî tenê ji bo Kurdan ne gereke, wî çaxî ji aliye Tirkân ve bi balkêsi tê qebûl kîn.

Eger I. Wallerstein bixwine, dibêje ku; Gerek tehlîla dewlet, civak û tevgera netewî ji nûve bê kirin û rîxistinê



civakî yê nû bêñ avakirin..

„Netew û netewperwerî tişteki ku bi kapitalizmê ve girêdayî ye. İro roj li cihanê sistemek aboriya yekbûyi heye. Pir dewlebûn û pir netewbûn nîşandeka pirse ye(?)“. Yanî welat, dirok, ziman, kultur hertişte ku li ser rûyê erdê xwe tev dide, di bin ronahiya ideolojiyek aborî de tê tehlîlikirin û antî Amerîkanazm jî xala referansan e.

Ew dîtinê marjînal ku gelek caran tenê di nava çepen radikal û nîşkarên ku li ser masan ji xwe re cîhañekê avadikin û di peyde difelişinîn tê qebûl kîn.

Wek tê zanîn, bi rûxandina Sovyetê ji dehan zedetir dewlet tenê li Rojavayê Ewrûpayê derketin holê.

Globaliseringa ku haya dewletan ji pêşketina wê heye, li cihanê belav dibe. (Mirov kare bêje ku globalisering di bin kontrola dewletan de bipêş dikeve.) Avakirin û mezinkirina YE, hatîna Amerika li rojhilata navîn û bi pêra bayê demokrasiyê....

Ev guhertinê mezin normale ku wê bixwe re dîtin û teoriyê ji bo rewşa nû ya navnetewî û civakî derxin meydânê.

Guhertinê jorîn bûn sedemên ku ji derya baltik heya derya reş, ji wir heta Qeskas bi dehan netew bi dirok, ziman, kultur û welatê xwe bigîhîn, formattionek nû, yanî dewleten serbixwe.

Meriv pir liberdikeye ku hînek wan guhertinan bi alikariya teoriyê anarîstî ji bo Kurdan negatîv şirove dîkin û hînek din ji jê bawerîn.

Bi ya min ew gewirandin tê wê wateyê; dewleten xwediyê ideolojiyên totalîter û nijadperest gereke xwe bigewirînin. Anglo Tirk, Faris û Ereb gerék xwe bigewirînin ne ku Kurd ji bo berdewamkirina hebûna wan alikariya wan bikin.

Di vê pêvajoyê de xala herî giring ku li hesabê ideolog, stratejê dewletê û dosten wê tê ew e; carek din mejiyê Kurdan cîlk bikin û wan bixin gengeşiyekê wek (((hûn netewin an ne netewin? Welatperwerî û netewperwerî nijadperestiye an na? Ma hûn Kurd wek netewkarin anjî gereke ku hûn bibin xwediyê desthilatdariya xwe, ma ne emperyalizme ku me bi hevdû dixe?))). Bi vî awayî Kurdan hem ji alî ronakbîrî de, kultura politiki de, ziman û hêjayiyê xwe de bixin nav kefteleftekê bêhîl û bê ali.

Bi kinayı teoriyê ku A.Öcalan wek çareyekê yegane dixwaze bi Kurdan bide qebûlkirinê qistasa wê ev e; ew dîtin ji kê re xizmetê dike? Bi destê kê? Ji devê kê? Ji bo kê tê zimên?

Diya wî mast û dimsa ku wî linav hev

xistibû ji ber wî rakir û di du sîneyîn nu de mast û dimsa nû danî berê.

Ez bixwe dibêm ku wê disa linavhe-xwe!

Taybetî û pêwistiyêñ pêvajoya avadariya Kurdistana Başûr

Naîf Bezwân

Dema nû, ku bi rûxandina rejîma jenosider ya Baasiyan di sala 2003an de li

Iraqê destpêkir, bi hilbijartinê li Kurdistan û Arabistanê, ber bi pêvajoyek zor giring ve dimeše. Ev proses, ger li gor hi-qûqa navnetewî, ger jî li gor rewşa fiili, di eslê xwe de prosesa mafê çarenûsi ye. Ev tê wê wateyê ku, wê gelên Iraqê di demek nezik de bi riya referandûmê li ser qedîr û pêşeroja xwe bîyar bidin. Ne tenê Kurd, lê herwiha wê Ereb jî, li ser statuya xwe ya siyasi û hiqûqi, anglo li ser form û naveroka rejîma ku ew dixwazin di bin de bijîn, dengê xwe bidin.

Birastî, ger mirov bixwaze taybet-mendîya rewşa iro bi şeweyekî zor zelal bîne zimên, divê mirov bêje ku, kî iro statuya xwe ya siyasi bi raya xwe tayîn neke, wê qedera wî li dijî irâda wî bê "tayîkîrin"!

Ji ber vê, ji ber ku prosesa piştî hilbijartinan karekterê xwe yên siyasi û hiqûqi ji mafê self determinasyonê digire, pêwîstiya yekemîn ewe ku Parlamenta Kurdistan li ser bingeha wî mafî û li gor daxwaziya mîletê xwe; ku ji sedî 98 ji bo serxwebûnê dengê xwe daye û bilind dike, zagontek bingehîn (constitution) ji nûve amade bike. Wek ku rêvebir û desthilatdarên Kurdan yên sereke gelek caran anîn zimên, pewiste ku di vê zagonê de sînor û şîklê Dewleta Kurdistanê bi iradeyek hevbeş; bê tayîkîrin û nasnameya Dewleta Kurdistanê wek Komarek plûral, sekuler, demokratik ya ku karekterê xwe ji desthilatdariya hiqûqê (rule of law) distîne, ji nûve bê tesbitkirin. Bi vî awayî, Parlamenta Kurdistanê wê ji aliyekî ve iradeya xwe ya azad di gel raya giştî ya cihanê ilanî bike û ji aliyê din ve, strateji û xerîteya xwe ya meşandina muzakeran digel heval û hempayêñ xwe yên Şî û Sunîyêñ Ereb re bide nasandin.

Baş e, îlankirina Komarek bi vî rengî, gelo ne li hemberî bîyara avakirina federalizmê li Iraqê ye? Ne bi ti awayî. Danêsandîn û avakirina Komarek ku li ser bingeha sekuleri, demokratî û mafen mirovan bê avakirin, ne li dijî bihevreyîjîyana digel gelê Ereb re ye, ne jî li dijî ceribandin û avakirina sistemek «federal, plûral û demokratik» dinav Iraqê de ye. Lî, berşertê serkeftina sistemek bi vî rengî li tevayiya Iraqê ye. Jîxwe, ji ber vê ye ku Kurd, ji hêla civaka navnetewî ve wek garantiya demokrasîyê têr nîxandin.

Pêwîstiya ku mirov aliyê siyasi, anglo bîyara esasî li ser statu û pêşeroja xwe, ji aliyê diplomatik, anglo ji aliyê danûstandin, bazarkirin, lihevirkirin an ji ne-lihevirkiranan cûda bike. Bîyara bingehî, ewê herwiha jîbo karên diplomasi jî di-gel hêz û aktorê heval û hempa de bibe bingeh.

Ger ku di encama referandûmê de Şî û Sunîyêñ Ereb jî dengê xwe ji bo sistemek «demokratik, federal û plûral» bidin, wê demê rêvebirî, Parlamenta û nûnerên Kurdistanê yên di nav Parlamenta Giştî de, wê bikaribin bi rêvebir û nûneren Şî û Sunîyan re liser naverok û karakterê federalizmê dest bi danûstandinan bikin. Ev dike problema diplomasîyê. Ger ku aliyê Şî û Sunî, wek minak, rejîmek teokratik an ji ne demokratik tercîh bikin, wê demê pêwîstiye ku Kurd wek ronîya çavê xwe xwedî li sistema xwe ya demokratik û sekuler derkevin. Ev ji aliyê siyasiye ku qedera Kurdan wek netew pê ve girêdayî ye.

Çima? Ji ber ku, dewletek bi vî rengî, digel pêwîstiya xwe ji bo demokratizasyona Iraqê û herêma Rojhilata navîn, ewê bibe garantiyek jîbo naskirina Kurdistan dinav qada navnetewî û model ji bo çareserkirina pirsa Kurdistan bi tevayî.

Lê, çiqas qedera Kurdan û çareserkirina doza Kurdistan bi avakirina dewle-

tek demokratik û sekuler ve girêdayî be, bicîhkirina bingehîn wê jî bi Parlamenta Kurdistanê ve girêdayî ye. Ji bo pêkanîna vê armansa pîroz, dîyare ku pêwîstiyek zor mezin bi avakirina rêvebireyek xurt li Kurdistanê heye.

Rêvebireyek ku dikaribe, ji aliyekî ve, enerjiya civaka Kurdistan, ci li Kurdistan, ci li derveyî welêt, mobilize bike, entegrasyona netewa Kurdistan lidor he-defen netewî pêşve bibe û her wiha demokrasîyê dinav xwe de kûf bike. Ji aliyê din ve jî, bikaribe, him di qada navnetewî de, him jî digel Şî û Sunîyan, têkîlî û danûstandinan bi awayekî serkeftî bide meşandin.

Parlamenta Kurdistanê dikare bersiva vê rewşa nazik bi avakirina sistemek prezîdiyal ji bo dema derbasê bide. Ew dikare dinav xwe de serokkomarekî, berê ji bo 5 salan û bi opsiyonâ dirêjkirina ji bo 5 salen din, hilbijere. Serokkomar ji aliyê xwe ve dikare sekreteran an ji kabîneyek xurt tayîn bike. Bi kêmâni 6 warên jînî hene ku bi sekreter an ji wezîrên zîrek, zana, xwedî bawerî û bîyar bîn tijekirin : Têkîlyen navnetewî, avadanî, aborî û teknoloji, parastina netewî, zanistî û perwerdekirin, edalet, hiqûq û demokrasî û her wiha karên hundirin.

Doza Kurdistan ku di encama perçekirina Kurdan wek netew û Kurdistan wek welat piştî şerî Cihanê yê Yekemin wek dozek netewî û navnetewî derket holê, li benda xwedîyê xwe ye. Ji bo çareserkirina doza Kurdistan û parastina serpehatiyên ku bi xwin û eşen bi milyonan Kurd, bi xebatên welatparêzan, bi şer û lehengiyen pêşmergan û gerîllan bidestketine, iro pêwîstiya Kurdan bi kesen wek George Washington und Thomas Jefferson heye. Doh yê ku ev xebata pîroz di bin şert û mercen zor û xedar de lidarxist û bingeh ji bo pêşveçûnê iroyîn danî Barzanîye Mezin bû, iro jî çavê 40 milyon Kurd li ser Birêz Mesûd Barzanî ye.

Ala rejîma hilweşayî li Silêmaniyê ci dike?

Simko Girikî

Ez hez dikim li ser babetekê rî li giftugoyek di navbeyna rewşenbîr û siyasetmedarêñ Kurd de vekim. Ev babeta hanê bûye tabûyek û tu kes newêre nêzik bibe. Gelo çawa Partiyek Kurd ala rejîma 35 salan ku liser serê gelê Kurd ev çend xwinrij û talankarî kiriye, liser meclisa xwe û daîreyen xwe de bilind bike?

Bi rastî ez nizanim jiber ci Partiyen Kurd vê helwesta nerast naxwazin bibînin? Ew alaya ku iro mexabin YNK li Silêmaniyê liser meclisa xwe hildaye jor, ya ku bi sedhezaran Kurd di bin de hatine şehîdkirin, talankirin û mihacir kîrin.

Belê, di bin wê alaya rejîma ruxayî de, ku iro bûye nişana bilindiyê ji bo Partiyek Kurd, 182 hezar insanê me hatine şehîdkirin. Liber sêbera wê alaya rejîma ruxayî de 8 hezar Barzanî hatin kuştin. Her libin siha wê alaya rejîma xwinrij de bû, ku 7 hezar Kurdên Feyli hatin kuştin. Belê, her di bin wê alayê de bû, ku 5 hezar Kurdên Helepçê bi çekêñ kimyawi hatin kuştin. Belê, her dîsa di bin wê ala hanê de, ji 7 hezar Kurdan zêdetir li Helepçê bi çekêñ kimyawi hatin birîndar kiri. Belê, her di bin wê alaya ku YNK di daîreyen xwe de, li ser masan danîne, 4500 gundêñ Kurdan hatin hilweşandin û wêran kiri.

Eger, ew şehîden me bikarîbana rabin ser xwe, bêguman dê ji me pirsbikirana "gelo em di Kurdistanâz aded de dijin, an li cihekî dî ?

Bi çendin car rêzdar Mesûd Barzanî ev helwesta hanê ina ziman. Cenabê wî got, ku ew ala nikare bibe remza mîletê Kurd û remza Iraqueke demokrat. Belê, nabit ew alaya ku bi hezaran Kurd di binde şehîdbûyi li Kurdistan bête hildan. Lî tiştekî balkêse, ji tu partî û şexsiyeten Kurdistan deng dernakeve, û heta iro jî derneketiye.

Zarok û mindalêñ Kurdan heta iro jî li bav û birayêñ xwe digerin, li xwişk û dayikêñ xwe digerin. Lî mixabin ew al hêjî li beşekî Kurdistanê li ser axa pîroz û azad xwe li bayê Kurdistanê dide.

Divê mirov pirsiyarekê dî bike, gelo çima hikûmeta iro ya li Bexdayê ala Kurdistanê hilnadin jor ?

Gelo wezifeyek ji wezîfîn rojnameya Peyama Kurd, ku dibêje û iddia dike ku ew serbixwe ye û di rîya Kurdayetiye de kardike, di derbarê vê rewş û bikarînandina ala rejîma ruxayî liser serê Kurdan li herêma YNK ciye?

Yan jî, Partiyen Kurd ji bo vê helwesta nerast ci difikirin?



Eniya Tirkmenan bedêla dilxirabiya xwe dide

PK - Ji ber siyaset û helwesta xirab a li himber Kurdistanê û Iraqê, du berpîsiyarên Eniya Tirkmenan istifa kirin. Li gora daxuyaniya Cigirê Serokê Partiya Niştimana Tirkmenê Iraqê İbrahim Qesab û Cigirê Sekreterê Giştî Dilşad Hoca ku di heftenameya Mîdiya de hat weşandin, ragihandin ku wan destê xwe ji Eniya Tirkmen û Partiya Niştiman kişandine. Partiya Niştiman di nav Tirkmenan de mezintirin parti ye.

Li Kurdistanê seferberiya xwendin û nivîsandinê

PK - Seferberiya perwerdekirinê ya hikûmeta Kurdistanê û hin saziyên alîkariyê yên Ewrûpi encamek serkefti da û ışal 38 hezar û 150 kesan xwendin û nivîsandin temam kir.

Perwerdeyi li bajarên Kerkûk, Zaxo, Dihok û Hewlerê hat lidarxistin û rojê 4 seet bû.

Li gor agahdariyan, gel eleqeyek baş nişanî vê çalakiyê kirine û daxwazên xwe ragihandine Wezareta Perwerdeyi ya Kurdistanê ku ji bo zimanên biyanî û Kurdi ya bi tîpêni Latinî ji hewl bide.

Konfiranseki li Dortmund ê

Mahir Barwari/ Dortmund

Di roja 15.05.05an de Komela Ci-vata Kurd li Dortmund, seet ji 2 heta 7an li komela navbirî, bi amadebûna endam û mîhanen herçar parçen Kurdistanê konfiransa xwe ya salane girêda.

Di konfiransê de raporta salane ya kargêri (îdarî) û mezaxtinê (diravî) hatin xwendin û ji layê Endam û mîhanan ve hatin gengeşî û şirove kirin.

Li dûv de bi rîkek demokratik helbijartinê desteka birêveber ya nû ji bo komelê hat kirin û heft kes hatin diyarkirin. Ew di nava xwe de wê serok û cêgir hilbijêrin û karê endaman destnisan bi ken.

Komita nû bihevre soz dan ku di berdewamiyê de xizmetkariya revend û doza Kurdi bikin.



Platforma Jinê Kurdistan civîna xwe li Osnabrückê pêkanî



PK - Platforma Jinê Kurd -PJK civîna xwe ya 12. di navbera rojê 14ê Gulânê heta 16ê Gulânê de li bajarê Almanya Osnabrückê pêkanî.

Di wê civîna 3 rojî de ev babetê jîrîn hatin gengeşî kirin:

- Cînayetên namûsê
- Di stranêni Kurdî yên klasik de dîmen û jiyana jînêni Kurd. Ji stranêni klasikên Kurdi jî piranî li ser stranêni serhêdê û taybetî kevneşopa Evdalê Zeynikê hat sekinandin.
- Di nav Kurdan de wek haceteke pêvendiyê pirsa ziman e. Ew babet di çend aliyeñ ve hat gengeşî kirin.
- Ya yekemîn li ser hat sekinandin ku cîma Kurdîn Bakûrê Kurdistanê di nav xwe de Kurdi naheyivin?
- Ya duwemîn disa li ser pirsa cîma Kurdîn Bakûrê Kurdistanê ku li Ewrûpa dijin, di nav xwe de û bi zarokên xwe re bi Kurdi naheyivin.
- Yanî bi giştî li ser pirsa

cîma zimanê Kurdi di nav Kurdîn Bakur de ne haceteke pêvendiyê ye, hat sekinandin.

- Di nav jînêni Kurdan de li ser internetê pêkanîna pêwen-diya rîk û pêk.

Di dawîya vê civîna 3 rojî de jînêni Kurd bi enerjiya erêni ku ji hevûdû girtibûn, ji bo civîna çapemeniyê bernama xwe çekirin.

PJK bîryar girt ku civîna dahatîli Dortmundê bê çêkîrin û li ser babeta, „Pirsên jînêni Kurd yên Ewrûpa û çarese-riya wan“ bê sekinandin.

Dîsa ewana bîryar girt ku heta mumkun be şandeke jînêni Kurd bişînin Kurdistanâ Başûr, daku ew di çarçewa dewleta Kurd de rewşa jînan çavdêri bikin û wek rapor pêşkêsi civîna dahatî bikin.

PJK di 1994 an de ji aliye jînêni çar parçeyen Kurdistanê hatiye damezrandin. Jînêni ku di Platformê de cih digrin xwedî dîtinên cûrbecûr in.

MHP li Kurdistanê bi cih dibe

PK - Li Kurdistanê bi besdarbûna hin eşîret û parêzgerên gundan dewlet, partiya faşistên Tîrkan MHPê li Kurdistanê roj bi roj bêtir bi cih dike. Niha berpîrsên vê partiyê vekirî diyar dîkin ku armanca wan li Amedê û hin bajaran de ku ne Tîrkhene û ne jî di dîrokê de MHP qet nikarîbû gav bavetiya, wekilan derxîne û bişîne meclisê. Cigirê Serokê Giştî yê MHPê Mehmet Şandar radîgîhîne ku partiya wan li Kurdistanê xurt dibe û serokatiya bajare Amede baş dixebeite.

Serokê MHPê li Amedê Abdulla Arzakî dibêje ku 5 hezar kes besdarî partiya wan

bûne û ev ji bo herêmê rekore. Arzakî nêzikiya nêrînê xwe û Öcalan û hevalen wî bi awayekî balkêsanî ser zîmîn û got: „Ji berî niha bi deh salan kesi di xewna xwe de jî bidîta bawer nedikir. Eger mirovek neteweperwer (millîyetçi) be ne şerte ku Tîrkhene. Ya girîng hevwelatiya Komara Tîrkhene ye. Di malbata min de Tîrkhene. Diya min Zaza, bavê min Kurmanc e. Ez di 15 saliya xwe de fêri zimanê Tîrkhene.“

Mixabin, li Ameda ku berî 1980î yekî faşist newêribû têkeve bajêr, iro bi saya Demokratik Cumhuriyetiyan lotka didin xwe

Pêwîste piştgiriya Başûrê Kurdistanê bi rîyek rast bête kirin...

Dara Bilek

K onaxa ku Tevgera Kurd têre derbas dibe geleki giring e. Bi taybetî rewşa ku li başûrê welatê me destdayî, bingeha giringiya vê konaxê pêktîne. Wek hemî Kurdistan besen din yên Kurdistanê rojeva tevgera Kurd li Bakurê Kurdistanê jî Kurdistanâ Başûr e. Bêgoman ev yek cihê dilxweşiyê ye. Gerek em hemî destkeftiyen Başûrê Kurdistanê wek bîbûka çavê xwe biparêzin û bi hemî awayî li vî besê welatê xwe xwedî derkevin. Lê gerek em vê yekê biçekî din bi zaebûn bikin û hewlbidin ku xeletiyekê nekin da ku li şuna feydê tu ziran nedin siyaseta vî besê welatê xwe.

Cardin dixwazim dubare bikim ku, xwedilêderketina Kurdistanâ Başûr erkek netewî ye, heta ji bo min pîvanek ya welatparêziyê ye. Di rastiya xwe de cureyê xwedilêderketinê û piştgiriye geleki girîng e. Dema em piştgiriya Kurdistanâ Başûr dîkin, gerek em xebata di besê xwe de jîbir nekin. Eger ev yek bête jîbirkirin wê hingê piştgiriya me ji bo başûr wê bibe bargiraniyek ji bo desthilata Kurdistanâ û emê bibin barek gîran li ser milen wan. Bi awayek din, carna mirov dixwaze basiyekê bike lê cureyê xebatê dikare bibe sedemê hinkê xirabiyen. Herweha gerek bi tu awayî Kurdistan besen din xwedilê derketina başûr nekin malzemeyek siyasi û ji bona hînek berjewendiyen taybetî bikar neynin. Ji ber vê yekê gerek em tev di derbarê Başûrê Kurdistanê de gelekî hesas bin û li gora vê hesasîyetê cureyê xebata pişgiriyê kifş bikin.

Dema tevgera Kurd li ser bingeha siyasetek, Kurdistan pêşbîkeve, wê tesirek gelek erêni li kar û xebata besen din jî bike. Eve Kurdistanâ Başûr nimûneya heri berçav e. Rewşa Kurdistanâ Başûr tesirek gelek erîni li besen din yên Kurdistanê kiriye û herweha bûye sedemek bingehin ji bo pêşketina tevgera Kurdistanâ. Ev rastiye din jî derdexe holê ew jî ewe ku; ji bo pêşketina rewşa Kurdistanâ Başûr gerek em di besê xwe de gelek bi hêzbin û bi hemî awayî giraniyê bidin karûbarê xwe da ku hêzbûna me ji bo başûr bibe kelehek ya parasinê.

Rewşa tevgera Kurd li Bakurê Kurdistanê ne baş e. Tevgera Kurd di pêvajoyek gelek taybetî re derbas bû. Guhertinê cihanê û herêmê bû sedemek bingehin ku rewşa Kurdistanâ Bakur xirabtir nebe.. Lî iro eşkere dixuyê ku Kurdistanâ Bakur piralî di nav legerînekê dene û rewşa tevgera Kurdistanâ ji gelek aliyan minaqaşe dîkin.. Ev yek di rastiya xwe de cihê dilxweşiyê ye û herweha hêviyên mezin ji mirov re çedike. Di baweriya min de wê Tevgera Kurd li Bakur di dêmek nêzik de bigehe konaxek bastir. Dema em wek Kurdistanâ Bakur giraniya xebata xwe bidin nav xwe û tevgera Kurd bigîhînin aştek bilind wê hingê emê gelek rihet bikaribin piştgiriya xwe ji bo destkeftiyen Kurdan li besen din xurtbir bikin û taybetî ji bo Kurdistanâ Başûr. Wê demê piştgiriya me ne tenê bi qelemê be yan jî bi hînek çalakiyen lawaz bin. Em di besê xwe de çiqas bihêzbin ewqas emê bikaribin pişgiriyek xurt û bi naverok bikin.

Wek tê zanîn iro bi navê Kurdayetiyê li Bakur dijitiya Başûrê welatê me eşkere tê kirin.. Ev yek jî barek girantir dide ser milê me. Ji xwe gelek caran siyaseta dewletê ya dijberiya Başûr rîya vê siyaseta çewt tê bi rîvebirin. Ev yek jî dihêle ku mirov di derbarê siyaseta xwe ya Kurdistanâ Başûr de gelek hesastir kar bike. Me bîvê nevê tevgera Kurd li Bakur di bin bandora siyaseta çewt de dijî û destkeftiyen Kurdan têr bikaranîn.

Heta wek vê gavê dema dewlet dijitiya destkeftiyen Başûr dike û dixwaze bibe tehdidek li ser Başûr, tu hesabekî ji tevgera Kurdistanâ Bakur re nake. Ji ber ku tevger gelekî lawaz e. Lî xurtbûna tevgera Kurd wê bîhêle ku dewlet di siyaseta xwe a derbarê Başûr de bi góman he-reket bike û herweha wê hesabê Kurdistanâ Bakur bike. Ji ber vê yekê bila em piştgiriya Kurdistanâ Başûr di xurtkirina Tevgera Kurdistanâ Bakurê Kurdistanê de bibînin.

Jinekolog, mîrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr.

Fatê Were Civatê**Şexbat**

Fatê, bi rêberiya qizikên wek te 70 sali ma jinê Kurda çiqasi jîr bûne yaho! De allah wekilê xwedê, heger jinê Kurda ne bindest bûna, niha wê balon ji zikê zilaman çekirana ha! Hingî hewqasî jîr bûne. Lî derdê giran ciye tu zanî? Dibêjin kevirekî mezin li ezmana dizivire û nêzik bûye ku li dinyayê keve. Heger li dinyayê keve, kevir li ser kevir namîne. Ji ber vê, Amerika û Ewrûpa dîkin û nakin nikarin jêre çareseriye bibinin. Lî mîzgina min li te, jina min çareserî jê re dîtiye. Wê rojê di ser xwarinê de jina min got "aha, min çare ji wi kevirî re dit!" Min go ciye? Wê got "bila dev ji kevir berdin heta ku li erdê ket. Pişti wê hûrkirina wî li min. Ma pir pir zehmetiya hûrkirina wî kevirî wek hûrkirina barek êzing be, weki din!" Xaltîka Fatê, de ka ji kerema xwe ji Amerika re bêje bila vi derdi li hêviya me bihêle. Belki bi xêra vi kevirî dengek bi me keve û emî meşhûr bibin gidi! Lî biner, heger kevir hat û ket behra kûr işe min jê tune haaaa!

Zîwerê bextreş / Bielefeld

De yaboooo! Fatê were civatê! È lao Zîwerko, ez dibê bira qey jinka te balon ji zikê te çekiriye! È lao welleh ê min min kir û nekir go ez karibim zikê mîrkê xwe binepixînim, min nikarîbû loo! Kuro ez xaltîka te me! Bi wî serê teyê şimamokî, ezê bikim go jinê Kurda ne zikê mîrén xwe, lê qûna qan ji binepixînin lo! Tu hineki din ji bisekine, heger te rojekê dît go mîrén Kurda hemi bûbin HomoKurd û jinê Kurda ji bûbin Feminist, qet şas nebe! Te go jinka te çare ji kevirê ezmana re dîtiye? Naloo! È berxê mino, ma jina go şîretên Fatê bixwine û çarê nebîne, divê meriv jê şikê bike haa! Naxwe çareya go Amerika û Ewrûpa nedîtin, jinka te dît! Wey bavooo! Tu çima nabê emê jinka te bikin namzeta xelata Nobelê loo! Bi xwedê go niha Einstein sax ba, wê ji qehra porê serê xwe hilkira haa! Na na, qet me-raqa nekin, ezê niha ji Serok Bush re bêjim, bila wî kevirî danexînin bêhra kûr. Ezê bikim go ew kevirê ezmana hêdî hêdî, nazik nazik, di sîetê de bi xurtbûnek 500 kilometroyî bê li ser xaniyê we deyne! Bila jinka te ji rahije çakûc û mîkutê xwe û wî kevirê medenî, hûrik hûrik hûr bike, ma ne başe Zîwerkê min!



Xaltîka Fatê, ma xune derdê min û è kesî wek hev e! Ma tu zani bê ci hatiye serê min malneketê! Şevê din min xewnek ecêb dît. Di xewnê de ez li nav bexçê bihuştê bûm. Der û dora min hemi misliqên avê bûn, xuşxuşa avê ji wan dipiqi. Carekê min dît zilamekî kal û rîhspî di ber min re derket. Min navê wî pîrsî ewî got "ez Xocê Xizir im". Min gotê "ya Xocê Xizir, ma evqas misliqên avê ji bo ci ne?" Ewî got "xwarzê ev qismetê însana ye, her misliqek qismetê însanekî ye". Min gotê "başe, ka misliqa min, ka qismetê min kîjan e?" Ewî ez birim ber misliqek zingargirtî ku nîv seetê carekê dilopek av jê tê. Min gotê "ya Xoce, çima qismetê min wilô kêm e, çima ava misliqa min naherike?" Ewî got "xwarzê emrê xwedê ye". Xocê Xizir xatir xwest û çû. Min ji ji xwe re got "aha, icar fersend e, ezê tiliya xwe têxim misliqê, qula wê fireh bikim û qismetê xwe vekim". Wele min tiliya xwe têde bir û anî, bir û anî û hey bir û anî. Carekê agir bi canê min ket! Bi vê êşê re ez ji xew veciniqîm, lê ez ci bibinim baş e! Min tiliya xwe kirtye qûna xwe û ez qismetê xwe vedikim! Ma ne ecêb e xaltîka Fatê! Ma heqî ev e?

Mihemedê Xezîneci / London

Wey bavo, wey bavoo! Lao min xewn dîtin lê ne bi vê ecêbê looo! Bihuşt, Xocê Xizir, misliq, qismet, halla hallaaa! È kurê kerê ci karê te li bihuştê hebû hêê? Tu çima neçû cehnemê lê te berê xwe da bihuştê bêaqilo! Tu çûba cehnemê cem, Hawa, Kleopatra, Semîramîs, Um-kelsûm, Zubeyde xanim, Katerîna, Diana, Marilyn Monroe, Eyşanê, Seyranê, ma ne çêtir bû ehmeqo! Ci karê te li cem Xoce û Sofikan hebû lao! Te go dora te hemi kaniyên avê bû? Tewww! Kuro lao, ew kaniyên avê qismetê merivên dewlemend in, è Sabancî ne, è Şêxê Ereba ne, è Erbakan e, è Özkök e, è Kamûran Înano ye! Ma heta evên dewlemend hebin dora qismet tê te bêaqilo! Ma te çima tiliyek tenê xiste misliqê rebeno? Ma bi tiliyekê tenê qismet vedibe lao? Te du tilî xistiba xezîna qûna xwe, sê tili, çar tili, ji xwe te destê xwe sax têxistayê allah wekî wê qismetê te wek çemê Feratê bûherikiya haa! Tembiya min li te be, carek din heger tu li qismetê xwe geriya, destê xwe û lingê xwe jî têxê! Te nerî go qismetê te venabe, icar wer cem xaltîka xwe Fatê, ezê qismetê te wilo vekim go wek petrola Kerkûkê dûman biserkeve!

SEREJÊR		1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1.	Modern, hemdemî, nûjenî / jiyana bi mirin, bi dawî, nedomdar										
2.	Li Swistreyê navê çemeki / dinya, alem, erdû ezznan										
3.	Jin dixin lingên xwe, ziynetek xweşikbûnê / çemê çikayı, newala kêm av (paşûpê)										
4.	Kurtenivisa "rabûn û rûniştin" / bindesti, hêşiri										
5.	Destrişaniyek / herna, qe nebe / notayek										
6.	Cementoya ruhn, serfîrin, xerac (paşûpê) / rîlibergirtin, stran										
7.	Êzing, çandîniyek (paşûpê) / tiştên li ezmana têr dîtin, tiştên nenas / kurtenivisa "Kongra Netewiyya Kurdistan"										
8.	Kamili, bilindayı, balayı (paşûpê) / neqîş, şiklikirin										
9.	Kesê masiyan digire, masiyan / notayek										
10.	Kesê ku fistanan didrû, terziyê fistanan										
11.	10. Kurtenivisa "alikariya normên encama insen" / kurtenivisa insan										
12.	11. Serê xêni, jora xêni (paşûpê) / ketin, xistin										

Xaçerêz

1. Kar, xizmet / talûke, erêna 2. Deng, awaz / titik, li ber pencera dikeve 3. Stuxwar, bindest / bilindî, abadîn, kemlânî 4. Mixabin, heyf / bi Ingilîzi jin 5. Cemidiye, sermaye (paşûpê) / kesê ji gundê Xursê be 6. Paq, çim, hêt / bi Almani "baş, narin, nazik" 7. Pirsnişanek (paşûpê) / naveki mîrân / heywanek 8. Xwedayekî Yûnaniyan, paytextê Yûnistanan 9. Kesê ku fistanan didrû, terziyê fistanan 10. Kurtenivisa "alikariya normên encama insen" / kurtenivisa insan 11. Serê xêni, jora xêni (paşûpê) / ketin, xistin 12. Bêav, muhtaci avê (paşûpê) / zift, pê rê têneyandin, reşî / xwarinek

ÇEPERAST

- 'Ceperast' 1. Zindî / aramî 2. Ramarî 3. Rd / rovî / or 4. Danû / agîri 5. Amade / oam 6. La / and / mak 7. Endam / li 8. Imkanat 9. Ama / mîrane 10. Serseri / am 11. Ace / namlî 12. Na / xiyanet

Serejêr

1. Zerdali / asan 2. Dama / imeca 3. No / na / emare 4. Rûdank 5. Iro / endametî 6. Ava / danêr 7. Amigo / marina 8. Ra / iam / ta / an 9. Anormal / name 10. Mirî / kiremit

Bersivêñ hejmara berê**'Ceperast'**

1. Zindî / aramî 2. Ramarî 3. Rd / rovî / or 4. Danû / agîri 5. Amade / oam 6. La / and / mak 7. Endam / li 8. Imkanat 9. Ama / mîrane 10. Serseri / am 11. Ace / namlî 12. Na / xiyanet

Remîklâank	
Beran (21.03-20.04)	Mêzîn (23.09-22.10)
Ji ber tengasiya aborî moralê we xirabe ye, lê zanibin ku berxwendan nîşana serketinê ye.	Hefteyek xweş û ronak e. Wê ev hefte li gor dilê we be, gelek tiştên balkêş diqewimin.
Gamêş (21.04-20.05)	Dûpişk (23.10-21.11)
Xérnexwaz dixwazin we ji rê derxin, li xwe miqatebin, hûr tevbîdin lê kûr bikolin.	Henekpêkirin karekî nebaş e, kesekî piçûk nebinin, ji bir nekin ku dinya bi dorê ye.
Cêwî (21.05-21.06)	Kevan (22.11-21.12)
Hûn li bendî nûnce û xeberekê xêrêne, lê her tiştê xwe pê ve girêne-din, bê hêvi nemînin.	Serê xwe bi kar û barêñ piçûk re neêşînin, mezin bifikirin, kûr û dûr bikirin, radest nebin.
Kevjal (22.06-22.07)	Kovî (22.12-19.01)
Di rojêng teng de alikariyê ji dostêng qenc bixwazin, zanibin ku destê bi tenê deng jê nayê.	Hûn di nava liv û heyecanek mezin de ne, riya evînê vekiriye û mizgînyen xêrê dixuyin.
Sêr (23.07-22.08)	Satîl (20.01-18.02)
Bi galgal û zimandirêjiyê meriv bi ser naakeve, firêza meriv çalakî û xebata berbiçav e.	Pişti tengahiyê firehiye, dev ji kar û barêñ xwe bernedin, xwedê alîkarê mirovîn qenc e.
Simbil (23.08-22.09)	Masî (19.02-20.03)
Rojêng xweş li bendî we ne. Ji zexeli û békariyê tişt dernakeve. Xebat nîşana azadiyê ye.	Hefteyek çalak û livbaz e. Karê xwe nivco nehêlin, ji xwe piştarbin û ji kesi bawer nekin.

Zelal

Bayiyen Zelal

AKCAN GmbH (HAMBURG)
Tel.: 040 723 402 96

LIZA GmbH (BERLIN)
Tel.: 030 390 380 30

**ESD Softdrink GmbH
(MANNHEIM)**
Tel.: 0621 318 76 70

**TRINK-ZEL II
(DÜSSELDORF)**
Tel.: 0211 49 62 150

CAN GETRÄNKE (ESSEN)
Tel.: 0201 289 74 17-18

TRINK-SEM (DORTMUND)
Tel.: 0231 981 86 23

**HARRAN GmbH
(FELLBACH)**
Tel.: 0711 592 08 64

**CHAPLIN GETRÄNKE
(BREMEN)**
Tel.: 0421 691 96 78

**EURO-FRESH-FOOD GbR
(ERFURT)**
Tel.: 0361 26 27 516

TRINK-ZEL I (KÖLN)
Tel.: 0221 977 63 11

NERGIZ
Tel.: 02562 22 168



**Navend:
Trink-Zel (Köln)
Tel.: 0221 376 24 05**

Bedewa dilpak!



Lîztikvana navdar û bedew Angelîna Jolie, ku bi dilxwazî wek balyoza Komsêriya Bilind a Koçberên Yekîtiya Milletan dixebite, heta niha li 20 welatan geriyaye û serdana kampê koçberan kiriye.

Nêrgiza Omerî

Lîztikvana navdar û bedew Angelîna Jolie, ku bi dilxwazî wek balyoza Komsêriya Bilind a Koçberên Yekîtiya Milletan dixebite, heta niha li 20 welatan geriyaye û serdana kampê koçberan kiriye. Angelîna Jolie, bi van serdanan bûye sedema bidestxistina alîkariyên mezin. Jolie serdana xwe ya dawî li Pakistanê kir û di derbarê koçberên Afganî de bi Serokwezirê Pakistanê re hevditinek lidarxist. Di vê serdana çarrojî de Jolie rewşa koçberên Afganî di cih de dît û ji bo baştirkirina rewşa wan ket nav hewldanan.

Yek ji jinêñ herî bedew û navdara sînemayê Angelîna Jolie wek qîmxwazekê alîkariya Komsêriya Bilind a Yekîtiya Milletan dike û bi vê alîkariya xwe dixwaze di rewşa koçberên di kampê welatên girêdayî Yekîtiya Milletan de başiyê çêke. Komsêriya Koçberan a Yekîtiya Milletan li bist welatan xebatên xwe didomîne û Angelîna Jolie heta niha li piraniya kampêni li wan welatan geriyaye û ji bo baştirkirina rewşa koçberên van kampan alîkari daye hev.

Angelîna Jolie, ev çend care wek yek ji jinêñ herî bedew û seksî tê hilbijartin. Di sala 1999an de, ji ber ku di filimê "jiyana hatîye dizîn" de performansek baş nîşan dabû, layiqî xelata Oscarê hatibû ditin. Di 27ê Tebaxa 2001ê de ji, wek balyoza qîmê ya Yekîtiya Milletan hat hilbijartin. Bi vî awayî Jolie, berpirsiyariya paraztin û piştgiriya koçberên ku di kampan de dijîn, qebûl kir û da ser xwe.

Angelina Jolie, bi vê berpirsiyariya xwe rabû û

heta niha serdana gellek kampê koçberan kiriye. Bi vê serdana xwe alîkariji koçberan re daye hev û ev wek raporekê pêşkêşî UNHCR ê kiriye. Di vê raporê de behsa rewş û pergala koçberên di kampan de kiriye û his û ramanê xwe anîye zimên. Jolie, heta niha serdana kampê li welatên mîna "Afganistan, Irak, Sierra Leone, Tanzanya, Pakistan, Kamboçya, Ekvator, Çeçenistan, Beyrut, Tayland, Fildişi Sahilleri, Namibya, Kosova, Rusya, Ürdün, Lübnan, Mîsr ve Tchad" kiriye û bi vê hewldana xwe ji van koçberan re bi milyonan dolar pere daye ser hev.

Jiyana Sînemayê

Angelîna Jolie di sala 1975an de li Los Angelesê hatîye dînyayê û keça lîztikvan Jon Voight û Marçhelîne Bertrand e. Jolie, ji piçûkaniya xwe ve di bin bandora bavê xwe de ma û cara pêşin di heft saliya xwe de teví bayê xwe di filimê "Lookin to Get Out" (1982) lîzt û gava xwe avêt sînemayê. Di 11 saliya xwe de, li Înstituya Şanogerîya Lee Strasberg ê perwerdeya lîztikvaniyê stend. Jolie, bi jêhatibûn û hunera xwe bal kişand ser xwe û ev bû sedem ku li Los Angelesê besdarî grûba "Met Theatre Group" bibe û li Zanîngeha New Yorkê perwerdeya sînemayê bistîne.

Em hêvidarin ku rojekê wê lîztikvana bedew û navdar Angelîna Jolie, koçberên Kurd ji bîne bîra xwe, li rewş û pergala wan ji bipirse û di dilpakî û alîkarxwaziya xwe de serketî be

Di Tewrat û Încîlê de Kurdistan (afirandin, tofan û roja qiyametê)



Fadil Özçelik

Di Tewratê de du çemên simbola Kurdistanê Dicle û Firat, li baxçê Adenê ye ku Xwedê li wir Adem û Hawa afirand û bi wan re jiyan mirovayeti destpêkir. Mirov li wir zêde bûn û li seranserê dinyê belav bûn. Lê ev mirov bê dilê Xwedê bûn; guhehkar, bi gir û zorker bûn. Ji ber vê yekê Xwedê ew bi tofanekê ji rûyê erdê rakirin. Keşta Nûh Pêxember danî ser çiyayê Agirî (li gora Kuranê ji çiyayê Cûdi). Her du çiya ji li Kurdistanê ne û bi vî awayî jiyan cara duyem ji li Kurdistanê destpêdike.. Piştî armancê Xwedê yén li vê dinyayê pêk tê, roja qiyametê destpêdike. Qada şerê roja qiyametê fireh e, heta. Misirê diçe ku beşek ji şer li çemê Firatê derbas dibe.. Di derbarê afirandinê de pirtûka Mûsa, Tewrat weha dinivise: Afirandin 2, 8-15 Xudan Xwedê, li rojhilate, li Adenê bexçeyek danî.

Mirovê ku afirandibû danî wir. Û ji Adenê çemek diza av dida baxçê û bi car

mili ji hev vediqetiya. Navê çemê yekem Pişon e... Navê çemlê duwem Gihon e... Navê çemê sêyem Dicle ye... Çemê çaremin Firat e. Ü Xudan Xwedê, ji bo ku li bexçê Adenê binere, tê de bixebite, mirov danî wir.

Belê, Xwedê li vî bexçeyê Adenê mirov afirand û zêde kir. Lê ev insan bê dilê Xwedê bûn; li dijî wî rabûn û gunehkarî, gîr û zordestî anîn rûyê erdê. Ji ber vê yekê Xwedê bi tofanek mezin ew ji rûyê erdê rakirin. Ev tofan li gor Tewratê li çiyayê Agirî û li gor Kur'anê ji li çiyayê Cûdi bi dawî hatiye. Nûh bi dilê Xwedê bû; lewra malbata wî, law û malbatê lawê wî ji bo ku zindî bimînin, ji xezeba xwe parast û berî tofanê keştiyek pê re çêkirin da. Xweda ji Nûh xwest ku ji hemû tiştên dijîn û xwedî bedenin cotekî (yek mî, yek nîr) li gel xwe li keştiyê siwar bikin. Afirandin 8, 1-4Xwedê bayek ji rûyê erdê rakir û av dahatin (daketen) û keşti li ser çiyayê Ararat rûnişt.

Afirandin 9, 1-15 Xwedê Nûh û lawê

wî piroz kir û ji wan re got: "Berhemdar bin û zêde bibin û rûyê erdê dagirin." İlham (best) Încîl bi beşa İlham bi dawî tê ku ji dîmenê (vahiy) Yuhan-na pêk tê û behsa roja qiyametê dike. Ev mijar di zeman û mekanekî fireh de derbas dibe.

İlham ji 22 beşan pêk tê û bi hatin û serkeftina İsa bi dawî dibe.

"... Milyaketê şesem li boriya xwe da. Min ji çar qiloçen gorige (qurbangeh-sunak) zérin ya li ber Xwedê bû, dengê bihîst. Deng ji milyaketê şesem yê ku borî di dest de bû, got: "Çar milyaketên ku li ber çemê Firatê mezin girêdayîne veke." Çar milyaketên ku tam ji bo wê seetê, wê rojê, wê mehê û wê salê hazir dihat girtin, ji bo ku ji sisîyan yekê mirovan bikujin hatin berdan..."

Milyaketê şesem tasa xwe valayî ser çemê Firatê mezin kir. Ji bo riya qralen ku ji rojhilate tê vebe, hemû ava çem zuha bû.

Rûreşıya Wezareta
Tirkiyê



Li Bazidê peykerê Ehmedê Xanê ji aliye Wezareta Çandê ve hat qedexe kîrin. Peykerê ku çêkirin û bîchikirina wî neh mehan ajotibû, xwedênegiravî ji ber sedema ku "gel li dijî peykerê Ehmedê Xanê ye, hêjayîyen manewî dêşîne" qedexe bû. Wezareta Çandê ya dewleta Tirkiyê naylon li peykerê Ehmedê Xanê pêça û ew hepîs kir. Béguman sedemênu rayedarê dewletê didin pêş, hemi derew in. Ew bi vê helwesta xwe, dixwazin rê li ber paraztina hêjayîyen netewa Kurd bigrin û nehêlin giyan û hişyariyek millî di can û mejîyê Kurdan de çêbibe.

Peykerê Ehmedê Xanê, li ser daxwaza belediya Bazidê, ji aliye Peykertraş Mehmet Siddik Alsut ve hatiye çêkirin. Lê vekirin û pirozkirina çêkirina peykerê Xanê ji bo demek nediyar hatiye lipaşxistin.

Belediya Bazidê, di sala 2003an de bîyâr dabû ku ji bo bîranîna fikarmendê Kurd Ehmedê Xanê li meydana bajêr peykerê wî daçikinin. Lê Wezareta Çandê li dij vekirin û pirozkirina peykerê Ehmedê Xanê yê Kurd derketiye û ev neh meh in ku Ehmedê Xanê di nav naylonek pêçayı de hepiskirî ye. Seroka Belediya Bazidê Mukaddeş Kubilay radigihîne "ji bo ku vekirina peykerê Ehmedê Xanê bi coşek mezin bê pirozkirin, me vekirin li paş xistiye. Lê piraniya xelkê bajêr dixwaze ku rojek berî rojekê peykerê Ehmedê Xanê bê vekirin. Dibe ku em di Heziranê de, bi minasebeta Festivala Çand, Huner û Tûrizma bajarê Bazidê de, vekin. Hetta em difikirin ku navê Ehmedê Xanê yan ji Mem û Zînê li parka ku peyker lê dimîne, bikin". Gora Filozofê Kurd Ehmedê Xanê yê nemir li bajarê Bazidê, di seraya İshaq Paşa de ye.

Kurdno !..
Bi kurdi bifikirin, bi kurdi biaxivin,
bi kurdi bixwinin û bi kurdi binivîsinin

Stockholm de qetliamî Hewler ame protesto kerdiş

Stockholm - 14î Gûlan de Stockholm de di kombiyayış viraziyayı. Kombiyayış verin sehet 13:00 de müzeyi etnografa è Swed de viraziya. No kombiyayış de çar parçê kurdistan re pisporan tarix û hali aktuel è kurdistan ser agahdarî da mêmnan.

Kombiyayış didin eyni roj sehet 18:00 de dest ci kerd. Bi no kombiyayışa kurdanî swêd qetliamî Hewler şarmizar kerd. No kombiyayış bi destî Hevkari, Federasyona Komeleyen Kurdistanê li Swêdê (FKKS) û Însiyatîfî Kurdistanê (IKS) amebi hedre kerdiş.

Bi name Hevkari Şefik Kaya, FKKS-Şermîn Bozarslan û IKS-Aziz Aliş qisê kerd. Mesajî Hukmatî Kurdistan Taha Berwari wend. Hancî mesajî YNK zi ame pêşkêş kerdiş. Nûneranî partianî swêd è Sosyal Demokratan (s) Maria Hassan, è Partiya Çep (v) Mat Einarson, è Yewbiyayê xortanî Liberal è Partiya Gel (fp) Fredrik Malm zi ita de qisê kerd. Piyerê qisêkerdoxan qetliamo ke 4 î Gûlan de Hewler de bi, protesto kerd.

Filmê Kurd xelayê "Şovalye" girot

Filmê rejîsorî kurd Hinar salem "Ziro Kilometre" Mihricana Filman è 58. è Kan de ca girot û "Xelayê Şovalye" girot.

Wezirî kultur è Fransa bi destî xo xela da Hinar Salem. Wezirî kultur è Fransa Hinar Salem re ina va: "Na hunerkariye Kurdistan a. Hunerkaro ke welati ey parce bû. Ez ey firaz kena û nîşanî Şovalye dûna ey".

Raya verîn yew weşanxaneyî Kurd festîvalê Tehran de ca geno

Tehran - Hefteku viyert Tehran de Pêşengehê kitaban è 18. viraziyay. Raya verîn na festîvalê kitaban de kurdistana azad re dezgehî çapkerdiş û vilakerdiş „Aras“ zi ita de ca girot.

Akerdişî festîvalê kitaban de mesuli alaşayanî PDK û İran doktor Şewket Bamernî, serekî İnstîtuya Kurd è Tahrîan Baram Weledbegî û xelyek roşnîr û wendoxanî kurd ke zaningehî Tehran de winenî, hedre bi.

Dezgehî çapkerdiş û vilakerdiş „Aras“ bi 10 henzaran kîtaba na festîval de ca girot û zaf yew hûmara gird roşnîrânî kurdistana rojhelat standî Aras ziyaret kerd.

Na festîval 10 rojî rûmena.



Bremen de yew vêve yo rind

14.5.2005 de bacarı almanya Bremen de yew vêve yo rind bi

M. Arif Ayçiçek

PK - Bremen

Zuma û vêv wahar keye vêvî û ma misafiri piyer piya no vêve yo rind û manedar de hedre bi. Ez vûna manadar, raşa no vêvî zaf manadar yew vêve bi.

Zûmayî ma Îmail (Nihat) BUDAN û vêvî ma Deniz BOZYIGIT şari Çolig è. È wîrdzi mintiqay PUEX ra yi.

Sera seri almanya re dost û merdimi zûmay û vêv no vêve de amebî piyehet, ma zi bi şahadî mueserî inan.

Manedariye no vêvî zi ina ya. Ma kird piyer piya welati xo ra wedar bi û ûmîno welat de bi macîr, lakin ma kulturi xo;

de destan nûsenî.

Wext vêvî ûmî, ma zi sey herkesi şî miyanî cemaat de cayî xo girot. Vêvî dest kerd pê, def û zurna cîna. No vêvî ma de raşa destan nûsiyay; herkesi kay kerd; la-wîki xo vayî, ref - ref govend tepiş. Vêvî ma rahatî û emniyet de viyert ra.

Def û zurna verî dîlayî (Delilî) cîna. No kayî dîlayî de kibarê û asalet esta, kênê û xuertan, cînî û camiyêrdan dêst yew-bînan tepiş û ref - ref govend girot. Bacê est wişk (Halay), kayî wişk de zerafet esta. Çolig de zaf lawîki no kay esti. Govendkaran piyer piya yew feq ra lawîki Zîrav, Sîlîmo lawo yariya, Awkê kaşûn



ananeyî xo; vêveyî xo; govendê xo; lawîki û dêrî xo; tê ard no welat. Senî ke ma kurdistan de vêvî xo kêrdê, ma bacarı almanya Bremen de zi eynî o qêde yew vêve viraş. Zerrê her kesî hem bibi şâ û hem zi tadayê bi. Çimkî ma piyer welati xo ra dûrkote bi, qehiryaye bi, lakin hêvî ma zerrê ma de mende bi.

Yew manedare no vêvî zi bi ke zaf sexsiyî mûhim zi ûmîbi û paşt dabî zûmay û vêv.

Ma destî yewbînan tepiş, govendê xo ûnt, ma herkesî lawîki xo vay û ma zerrê xo kerd rahat.

Yew aşm vêvî ya ver mi zûmay ra va: Nihat ti mereq mekir, ewel alla ma yew vêve nûnî rue, ma yew govend tepişenî, ma her yew lawîk vûnî, ma ca ra no welat

wişena, awa hatû, awa çu, Cêko dûzo herawo, Day lero yanî ci lawîki ma est, vayî.

Bi vatisi nê lawikana hesreti welat û hesreti Çolig kot zerrê millet. Ïta de qehiryayış zi bi, şâ biyayış zi bi. Kam ke berma, kam ke wiya, Çoligijan ke rewna yewbîn nêdibi, ita de yewbîn diy, hesretê xo viyerna ra. Ha sinasi û ha xêrib yewbîn diy, zerrê inan zi bi şâ.


Ma piyerin zerra safî ra vêv û zumay re mesûdê waşt. Ma vêvî Nihat de govend ra lawikan ra, vêng def û zurna ra, vînayışî embaz û sinasiyan re bî mird û ma zi zaf memnûn gêray a. Ma hêvî kenî ke è zi heyûn pêni emîri xo mesûd û serfiraz bêni kalîk û pîrik.

Heyeti YCK gerayışî xo ê Kurdistan qedna

Stockholm - Yewbiyayê cîniyanî Kurdistan (YCK) 2004 ra nat semedî kurdistana baştû a projeyan virazeno. Armancê nê projeyan a ya ke awankerdişî kurdistana azad û demokratik de cînî zi rolî xo biyari ca. È no çarçewe de hewl danî ke cînî ke koçber bi, bieski agêrî welati xo.

YCK yew mude cuwa ver semedî perwerde kerdişî malimanî qican 4 malim şawiti kurdistan. Înan Hewler de 40 û Silemaniye de 60 malimî semedî bahçê qicana perwerde kerdi.

YCK- swêd bi alikariyê Migrationsverketê, Yekitiya Jinên kurdistanê, Wezîrtîye Perwerde kerdişî, Wezîrtîye



Selim Cürükkaya

Aşmî Gulan

Eg şoreşî tîrkiya yew maratono dergo

Tî 100 metreyo verin bi serfirazî vazdayî

Tî ma piyerin a ver si bend

Eger ez to re qehriyena, dadi mi cînî mi bo

Esq bo to re lacek, esq bo to re

Can Yücel

Wext ke na aşm yena, di insani yeni mi vir. Yew Deniz Gezmiş, yew Ferhat Kurtay.

Wext Deniz Gezmiş de ez hama yew xortib. O qehremanî min o verinib.

Motorsikletê ey bi. Erdîşê ey dergi bi, ey parkê xo girotib pira û ortê zimstan de kotib rayer. Tersi ey cîniyeb, namê ey zi sey ey bi. Hêverî mi nêzannayn ke o yew merdim o. Mi vatiyen dê o ho miyanî behran de geyreno, çew nêşkeno ey tepişo.

O wext ke ûme tepiş, va : Ez genarali feqîrana

O sey yew qehreman şî hepisxane, sey yew qehreman mehkeman de qisêkerd. O sey yew qehreman şî veri darê dardkerdiş. O sey yew qehreman veciya ware û sey yew qhremen bi vîn.

O di ri nê bi, tersinik nê bi. Ey wext ke serbest bi çiney vatiyen, hapisxane de zi, mehkima ver de zi, daraxaci de zi eynî ci vay.

Ferhat çend Şîrin ra heskerdiyen, Ferhat Kurtay zi hend milletê xo ra heskerdiyen. O hendê behran xueri bi, hendê astaran berz bi. O hendê awê guelan vinderte bi. Wext ke zulm padışah bi, wext ke ters bi, wext ke insan bê ziwan bi; Ferhat pê adira xebere xo vay. Padışah rema, ters bi vîn, insan bi wahar ziwan.

Kes nêşka adır Ferhat hûnakiro.

A roja pey kam ca bi tarî, o adir o ca de vêşa.

Komeleyetî û paşgirotişi Hukmatî Kurdistan nê projeyan virazeno.

No semed bin serekiye Seyran Dûran de yew heyeti YCK-swêd 20 roj kuristan de mend bi, no heyet hefteko viyert age-ra ame swêd.

Türkiye de Fehmkerdişî Gel

Hespi Aydin

Hadiseyanî ke veri Mersin û Trabzon de û pey ra zi Adana di ceryan kerd, myanî entelektuelanî türkiye de Minaqaşayı gird veti werte.

Pisikolojiyi gel ser zaf ci amewo nuştiş. Mersin de wexti şahiya Newroz de alê tirkan bi desti çend qicana amebî vêşnayiş. Serekî hukmat û ordiyî türkiye amê lingan ser. Zaf ca de zi şari tirk penceran û dikananî xo ya alê türkiye Kerd dard. Cuwa pey zi Trabzon de çend xuertan vilavokê komela TAYAD kerd vila. Zaf insanan hucim kerd inan, milet waşt ke nê xuertan linc bikero. Milet nişanî faşistanî tirkan nişanî kerdiyen. Bacê zi eynî hêzan hucim kerd kombiyayışî HADEP û taye cepî tirkan ser.

Sebebî tehrik kerdişî na *Qetliamî Mereş (1978)* ra yew sehne millet çû? Kam ho nê şari tehrik keno? Qey na millet no qeyde tehrik û galeyanan re heđre ya?

Çep, rast. Liberal, heta faşistanî tirkan zi nê persan ser sarê xo decna. Her kesi vînayê xu nuşt. Rojnameyanî türkiye de nê hadisê di çiman ra amê minaqaşa kerdiş. Tayin sey mesulî Mersin de vêşnayiş ala türkiye çend qicî Kurdan û peynî inan de zi rexistinî kurdan diy.

Hanc inan Trabzon de çend xuerti kerdî mesulî tehrik kerdişî gel. Inan va ke nê xuertan gel



ard galeyan, provake kerd.

Oktay Ekşî zi nuşt ke nê xuertan gelê Trabzon provake kerd. Ardimcî serekî MHP Mehmet Sandir va: „Ki ganî waziyeti yersbiyayışî gel bigiro dikat, yeno vatiş ke qey milet nê hedisan de nişanî cinawiranî bozan myecnena ra? Çimkî milet zi seyulkuciyan tepki muecnena ra“.

Kî eşkeno vaco ke guna na milet re ke torî MHP eynî tepki muecnena ra.

Ideologî tirkan Dr. Ümit Özdağ semedî nê tepkiyanî nijatperest vuno:

“Hîrê-çehêr sero ke AB û ABD menfaati türkiye nêardî ca û no hal haysiyeti şarî tirk şikneno”.

Ez vuna ke herhalde Özdağ hegemonya ra qal keno. Çimkî AB semedî endamtiyê türkiye ha ardim kena. ABD zi hetanî ewro zerar nêdawo menfaati türkiye. Turgul Turkeş zi vuno ke türkiye de ciray zi Nazizm nêbiy.

La na raşt niya. Çimkî verî Ermenî û kurd amê qırkerdiş. Nazîyan nê qetliam xo re kerdî mîsal û inan zi eynî o qide Yahudi qırkerdi. Hitler bilasebeb

nêvato : ”Mustafa Kemal malîmî min o“

Bênatê pratik û teoriya nê di irqperestan de qet ferq çîneb. Sey teoriya ari (halishomojen) yew milet û berz vînayişî miletê xo, duşmenê milet û kulturani bînan. Her di rejiman zi semedî kuekra hâlkerdişî meseloa ciranî xo û mihalefeti gelî xo zi qetl kerda, guîn rişnaya.

Serekî DYP Mehmet Agar zi semedî nê hediseyan axûyî xo rişna û va ke adir kotça, o ca vêşneno. Rojnamewan Mehmet Y.Yilmaz nemcet bi zi Ağar kritize kerdi. La Ağar tehmûl entelektuelanî muhafazakaran zi nêkeno. Zaf yersbeno û herkesi tehdît keno.

La belkî o zi, eger hetanî o wext miyero cezakerdiş, sey Hitler sucanî û şarmî xo ver yew gule nûno sereyî xo ya.

Tayî intelektuelî tirkan zi nê hedisanî ser vinderti û derheqî ameyişiî Faşizm de tersi xo ifade kerd. Sey rojnamewan Ahmet Hakan. Ey zi bali hukmat tûnt nê hedisan ser. û vînayê hukmat verba çend xuertan sey provakasyon ,kritize kerdi. Ey nuşt ke şpenî nê hedisan de fehmkerdişî hediseyanî Sivas û Maraş est. Tayî rojnamewanan zi rojnameyanî islamî de nuşt ke encax demokratî ke hê miyanî dîndaran de ê, ê eşkenî Tîrkiya faşizm ra bixelisnî.

KONFERANS

Li Kurdistana Bakûr:

- * Berxwedana Netewî ya 1925'ân
- * Xoverdayışê Neteweyî yê 1925î

Gotarvan/Qeseykerdox:

Av. Osman Aydin

21.05.05, 14.30 h

Werkstatt der Kulturen

Wiesmann Str. 32, Berlin

Anadekar/Anadekerdox:
Institutte Ziwan û Kulturê Kürmancî (Zaza)-IKK e.V.

Însiyatîfi Vicnayoxanî Kurd ê NRW ra

Köln- Bajarî Almanya Köln de yew komê keşanî Kurd amê piyehet û bi namê “Însiyatîfi Vicnayoxanî Kurd” yew însiyatif na rue. Armancê nê însiyatif a ya ke vicnayişî parlementoyî eyaletê Rhein Westfalya ya Bakûr (NRW) de waşteyanî Kurdan raya peroyî re eşkira bikeri.

No însiyatifsebebanî ruenayışî xo bi kilmkî ina ûno ziwan.” Almanya de 700.000 Kurd ciwyenî, inan re 300.000 NRW de ciwyenî. 70 % Kurd bî welati Almanya. È welati türkiye ke bî welati Almanya inan re 60 % kurdi. Kurd iran, türkiye û suriye de sey gel nînî sinasayış. No rid ra kurdi hêna zaf semedî welatibiyayışî almanya ya motive benî.

Semed ke bénatê almanya û türkiye de alaqayı menfaat esti, kurd almanya de zi heqanî xo



è netewî demokratik re mehrum i. È mafanî kulturel û sosyal ke è koçberî bîn istifade kenî, kurd nêşkenî nê heqan re istifa de bikeri.

Însiyatîfi Vicnayoxanî Kurd wazeni vicnayoxî NRW vicnayışî 22 Gulan de rayanî xo bidî nê partiyan ke nê mafanî cêrinan qebul kenî:

1 - Gereka kurd almanya de sey yew gel biyerî sinasayış.

2 - Sey è koçberanî bîn gerekî ziwanî kurdi çapamenî de, televizyon û radyo de biyero destekkerdiş.

karardiş. Gereka semedî qicanî kurdan heqî perwerdekerdiş biyero sinasayış.

3 - Sey è bînan gerekî dewlet ardim bido dezgehanî kurdan zi.

4 - Gerak kurd baweriyani xo serbest biyari ca.

5 - Kurd rojhelatabenatîn de semedî tayinkerdişî qederî xo, semedî azadî û aştiya tekoşin dûni, gerekî no tekoşin biyero destekkerdiş.


Alaqa:seyidxan@peyama-kurd.com



خویندنه‌یه‌کی خیرا بو سەرداھنەکەی وزیری دەرەوهى ئەمريكا بو كوردىستان و عيراق

لاپەرەي ٢

ديدارىك لەگەل جەمهە سەعید حەسەن



• هەندىك پىيانوايىه زىاتر بە ئاراستەدى
دۇزىيەتىكىرىدىنى يەكتىنى دەنۋوسى، تۆ چى
دەلىتىت؟

• لە ئەنجامى هەلۋىستە توندەكانىدا
بەرانبىر پارت و لايەنە سىاسىيەكان،
دووچارى هەرەشە نەبۈوتىت؟

لاپەرەي ٦

ساسان دەرويش

بو كۆساري ھونەرمەندمان لەياد بچى؟

• كۆساري ھونەرمەندانە ئىا و ھونەرمەندانە
كۆچى كرد و خۇكۇشتىن لە ئىانى ھونەرمەندان
و شاعيراندا زۇر جار لوتكەي هەلۋىست
دەرىپىرىنى بەرامبەر بن مانايى ئىان و
ناپەۋاىيى وزۇلم و سىتم.

• كۆساري، شاكارە ھونەرىيەكانى گەيشتە
ئەو ئاستەدى گۆۋەپان و شەقامە گەورەكانى
شارى سىليمانى و جىئىەكانى دىكە
بېرىزىنەتىتە.

لاپەرەي ٤

سەلاح شوان

راگەياندىنى كورد و تەكۈلۈجيای كلاشى ھورامى!

• شوکور ئىيەمى كوردىش لەم داھىنراوە
گەنگەيى مەرقاپايدىتى بىيەش نىن و چوار
كەنالى سەتەلايتىمان ھەيە! كە بە زمانە
شىرىنەكەي خۇمان بەرنامەكانىيان پىشىكەش
دەكەن، كە لە رووى شىۋوەدە ھىچىيان لە
ھىچ كەنالىكى دىكەي ئەم دىنايە كەمتر
نېيە، بەلام ئەم تەننە لە رووى شىۋوەدە
نەك لە رووى ئاودەرۆكەوە!

لاپەرەي ٣

پەيامى كۈزۈد

رۆزئامىيەكى ھەفتانەي گىشىيە

زماھە ٣٧ (سالى يەكم)

٢٠٠٥/٥/٢٠

رۆزئامىيەكى ھەفتانەي گىشىيە

ترسى كورد لە:

مام جەلال يان دووبارە بۇونەوهى سەلاحدىن!



دۇرربۇوه
جۇزە نواندن
جەلال لە^ل
زاڭىتى رامىارى
بىنى

بەھىزى كوردىان دەۋىت و ئەمەش دەستەپەر
ناكىرت بە ھاتەثارى مەملەتنى دەسەلاتەوە چونكە
كارداھنەويەكى نىگاتىفى لەسەر گەل كورد دەبىت.
مام جەلال باشتىر وايد پەيوهندى خۆى لەگەل ئەمريكادا
بەكاربىتتىت تا پەيوهندى كورد و ئىسرايل بەرهە
ئاستىكى بىزىتىر بەرىت، بىن گومان عەرب بەگاشتى
و تۈرك بەتايىھەتى ئەوييان پىن خۆش نىيە، چونكە ئەو
ئاستە بەرەز كېشىي كورد بەرە و جىهانبىون دەبات
و چوارچىنە ناوجەبىيەكان دەتازىتتىت. تالابانى لەبرى
ئەوهەكى كۈلىك بۆز كورد بەكت، كەچى بە پېنچەوانەوە
بۆز جارى دووەم كۈلى لى ئەتكىت. جارى يەكم كە
بۆ مانگى سەرۆزك بۇو و اۋاڙى فىدرالىزىمى شارەكان
ھاتە ئاراواھ، ئەم جارەش جەغەفرى سەرۆزك و وزىزەن
كۈلى دووەمى كرد كە لە سوپىتى و وزىزەكاندا لە^ل
ھېچ شۇتىكىدا باسى فىدرالىزىم نەكرا. لە هەر دوو
جارەكەشدا مەسعود بارزانى سەرۆزكى **KDP** لە دوا
چەركەدا ئەمى بىگانە فەريای كورد و ھەلەي مام جەلال
چاڭ بەكتەوە. چاوخشاندىنگى بە دەركەوتەكانى
ئەم دوایيە مام جەلال، لە خىزەرخىستن بەولوە
بەرەھەمى بۆز كورد نەبۇوه. تالابانى ئەملى چاڭ بىزانتى
قاقچەكانى كورسىيەكى ئەو لەسەرى دانىشتوو
بە دەست دۇزمانى كوردەوهەي و هەر رۆزىكى بىت
راي ئەكىشىن، بۆزە با ئەم ماۋاھىد بە جىهاندا بەگەرى
و تۆزۈ سەرفرازى كورد لە دلى ئەو كەسانەدا
دايىنتى كە چاوى پىتىان دەكۆيت. تالابانى نايتىن
مېزۇويەكى سەلەھەدىن دووبارە بەكتەوە، ئىسلام و
عەرب پۇيىستىان بە يارمەتى و دۆستىتەتى تالابانى
نېيە، بەلام لە ھەمان كاتدا كوردى چەرساۋەھەر
چوار پارچەكەي كوردىستان چاۋەپنى كوردىيەتى مام
جەلال دەكەن. ھەلەتە ئەگەر بىت و مام جەلال بىتتە
پاپىلەكانى "پان ئەرەبىس" يش ئەوا هېچ عەرەبىك
تەنبا بىرىتىن بەتەنەن كەنەن دەزىزىتەتى
كە گۈنكە هەتا كېشىي كورد لە پارچەكانى دىكەش
چارىيەكى مۇدىن و ئاشتىخوازىان بۆز نەدۇزىتەتە
ئەوا كوردىستانى باشۇورىش ناتواتىت سەرەبەست
و سەرفراز پېشىكۈت و پەرە بە خۇي بىدات. بۆز
تالابانى و بارزانى گۈنكە كە ھەولى تەواوى خۇيان
بەدەن لە باتى ئەوهەكى كە كورد يەكتىر راوبىن بۆلەي
يەكتىر بەكتەن و يارمەتى و پېشىكىرى يەكتىر بەكتەن
لە راستىشىدا نە ئەمريكا و نە ئورۇپاشا پارتىكى
كوردى بەھىزىيان ناوىتىت، بەلكو مىلەتتىكى يەكتىر تووى

باشدارى كورد لە ٥٨ مەين فيستىقالى
"كان" ئىيودەولەتىدا

وزىزىيەرلىقى
و لاتى ئەم ھونەرمەندە بە ھۆي پەيمانى
لۆزەنەو دابەشكراوه، ئەم خەتكى كوردىستانە،
ئىيمە پىرۇزىيائى لە ھەمول و تىكۈشانى
ھونەرىي ئەم ھونەرمەندە دەكەين و خەلاتى
شۇقالييە ئى پى دەبەخشىن.

پەيامى كورد - كان - مەيتىدار زانى - رۆزى ١١/٥/٢٠٠٥
لە باشۇورى فەرەنسا و لە شارى كان، فيستىقالى كانى
نېنەتەوەيى بۆ "قىلىم" دەستېتىكىد. و تارى كردىنەويى
فيستىقالىكە لە لايەن دەرھەتىنە ئەمريكا "ئالىخاندەر
پاينە" دۆھ خۇتىنرايەوە. لەو فيستىقالىدا بە دەيان
ئەستىزە سېنەمايى بەناوبانگ و بە سەدان دەرھەتىن
تىندا بەشدار بۇون. لە مەراسىمى كردىنەويى ئەمير كۆستىريجا،
دەرھەتىنە بەناوبانگ يېڭىگۈسلاۋى ئەمير رۆشنبىرى
ئەكتەرانى فەرەنسى وەك: كاتەرینە دىنۇقى، چارلۇتە
كاینسىپرگ، چارلۇت رامپلىنگ و وزىزىيە رۆشنبىرى
فەرەنسا "رىزىز دەنيدىز" ئامادە بۇون. فيستىقالى
ئەمسالى "كان" لە لايەن دەرھەتىنە ئەمير كۆستىريجا و
بەريوە دەبرىت. لە نا ئەندامانى دەستە بۇ لەپەرەي ٥

لە بەرانبەر تەۋەزمى چەپلەرېزان و ھاوارى بېنى كوردىستان،

ئالاڭەي رەزىمە سەددام كەوتە ۋېرپىلاۋى كورددۇوھە



پالەوانانى سەرىك Kilometer Zero "بەلگىن بلگى" و "نەزى كىكى"